

# لینینیزم و
# مەسەلەی نیشتمانی

**ڕێکخراوی ڕۆشنبیریی جەمال نەبەز**

زنجیرەی کتێب (١٧)

سەرۆکی ڕێکخراو

**نیئمەت تۆفیق مەحموود**


٠٥٣٣٥١٠٧٦١ - ٠٧٧٠١٥٠٣٣٥٣

web: jnco-sul.org

ڕێکخراوی ڕۆشنبیریی جەمال نەبەز

نێونیشان:- سلێمانی، شەقامی نالی، گەڕەکی ٢٠٤ کۆڵانی ٨ خانووی ژمارە ١

**جۆزێف ستالین**

کرێکارانی دنیا یەکبگرن

# لینینیزم و مەسەلەی نیشتمانی

**(بەرپەرچدانەوەیەکی هاوڕێ میشکۆڤ و**
**کۆفالچۆك و خەڵکی ترە)**

وەرگێڕانی لە عەرەبییەوە: **جەمال نەبەز**
گۆڕینی لە لاتینییەوە: **ساڵح بێچار**

**سلێمانی - ٢٠٢٦**

ناوی کتێب: لینینیزم و مەسەلەی نیشتمانی
نووسینی: جۆزێف ستالین
لە عەرەبییەوە بۆ تیپی کوردیی لاتینی: جەمال نەبەز
گۆڕینی لە تیپی کوردیی لاتینییەوە: ساڵح بێچار
چاپی یەکەم (١٩٥٦) چاپخانەی کەریم کەرەم - دیمەشق
چاپی یەکەم (تیپی کوردیی ئارامی ٢٠٢٦) - چاپخانەی کارۆ
جواننووسی سەر بەرگ: ئەحمەد سەعید
دیزاین: هەرێم عوسمان
تیراژ: ٥٠٠ دانە

ISBN: 978 - 9922 - 8725 - 9 - 9
لە بەڕێوەبەرایەتی گشتیی کتێبخانە گشتییەکان
ژمارەی سپاردنی (٢٥١٢) ی ساڵی (٢٠٢٦)ی پێدراوە

مافی لەچاپدانەوە و وەرگێڕانی بۆ زمانێکی تر، لەهەموو جێیەکی
جیهاندا، بۆ (ڕێکخراوی ڕۆشنبیریی جەمال نەبەز) پارێزراوە.

پێشکەش بە:

**گیانی پاکژی (عوسمان سەبری ١٩٠٥–١٩٩٣) کە بێوچان لەپێناو زمانی کوردیدا تێکۆشاوە.**



مامۆستا جەمال نەبەز- عوسمان سەبری
لەسەر گۆڕی سەڵاحەدینی ئەیوبی
ڕۆژی سێشەممە ١٩٥٦/٨/٢١

هەوڵنامەی کتێب

# دەروازەیەك بۆ
# وەرگێڕانەكەی مامۆستا جەمال نەبەز

ناسیونالیزم وەک بابەتێکی زانستی و ئەکادیمی و جیاواز لە بابەتەکانی تر، تەمەنێکی درێـژی نییە. بۆ یەکەم جار، لە سەدەی نوزدەیەمدا، زانایانی بوارەکانی کۆمەڵناسی و سیاسی وەکو (هێردەر Herder)، (ڤێبەر Weber) و (کارل مارکسKarl Marx) باسی چەمکی ناسیۆنالیزم و نەتەوەیان کردووە. لە ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاستدا، چەند ساڵێک پێش شەڕی یەکەمی جیهانی و بە تایبەتیش دوای کۆتایی شەڕەکە و لە ئەنجامی ڕوخانی ئیمپراتۆریەتی عوسمانی، پرسی نەتەوە، نەتەوەبوون و دەوڵەتی نەتەوەیی، سەری هەڵدا و لە چەندین کۆنگرەی زلهێزە سەرکەتووەکاندا، لە ئەورووپا گفتوگۆی چارەنووسسازی لەسەر کرا و ژمارەیەک دەوڵەتی نوێی نەتەوەیی دامـەزران. لەم قۆناغە هەستیارەدا، کورد وەک گەلێکی جیاواز، تازە هەستیان بە نەتەوەبوون و کوردبوونی خۆیان کرد و دەستیان بە جموجۆڵی خۆڕێکخستنی سیاسی و دیپلۆماسی کرد. بەڵام دوای سەرکەوتنی یەکێتی سۆڤیەت

و هاوپەیمانان بەسەر ئەڵمانیای نازیی و دروستبوونی ژمارەیەکی بەرچاوی دەوڵەتی سۆشیالیستی لە ئەوروپای ڕۆژهەڵاتدا، پرسی مافی چارەنووسی گەلان بوو بە بابەتێکی گەرم، بە تایبەتیش لای ئەو نەتەوانەی کە تا ئەو سەردەمە لە ژێر دەسەڵاتی نەتەوەکانی تر و ئیمپریالیزمدا بوون.

چینی سیاسی، نەتەوەپەروەر و ڕۆشنبیری کورد زیاتر ڕوویان لە هزری سۆشیالیزمی مارکسی و لینینی کرد و یەکێتی سۆڤیەت وەک پاڵپشت و ڕزگارکەر سەیریان دەکرد. چونکە پێش شەڕی یەکەمی جیهانی، لە ئەدەبیاتی سیاسی لینین و ستالین و دواتریش یەکێتیی سۆڤیەتدا دان بە مافی چارەنووسی میللەتاندا نرابوو، دوایی پارتی کۆمۆنیستی عێراقی کە ژمارەیەکی زۆر و بەرچاوی کەسێتی و ئەندامی کوردی هەبوو، دانی بە مافی چارەنووسی کورددا نا وەک نەتەوە و ڕۆڵێکی گرنگی بینی لە هۆشیارکردنەوە و ڕۆشنبیرکردنی سیاسیی کورددا، ئەمەش لەدوای دامەزراندنی ڕێکخستنی سیاسی کوردیدا بوو. هەر ئەم فاکتەرانە بوون وایان لە مامۆستای کوردایەتی و پسپۆڕی زانستی کوردۆلۆژی دکتۆر (جەمال نەبەز) کرد کە ئەم نامیلکەیەی (جوزێف ستالین) کە لەسەر پرسی مافی نەتەوەکانە، لە زمانی عەرەبییەوە وەربگێڕێتە سەر زمانی کوردی و بە پیتی لاتینی و بە شێوەزاری کرمانجی خواروو،

لە ساڵی ١٩٥٦دا چاپ بکات.[١]

گرنگی ئەم پەرتووکە (لینینزم و مەسەلەی نیشتمانی - بەرپەرچدانەوەیەکی هاوڕێ میشکۆف و کۆفالچۆک و خەڵکی ترە) لەوەدایە کە تا ئەو سەردەمەیە، بە زمانی کوردی هیچ پەرتووکێک لە بواری سۆشیالیزمی مارکسی و لینینیزمی نەبووە و مامۆستا (جەمال نەبەز) لە هەستی کوردپەروەری و بەرپرسیارییەتی خۆیەوە، وەک تاکێکی کورد، بە ئەرکی خۆی زانیوە ئەم بەڵگەنامە گرنگە، وەک دانپێدانانی مافی نەتەوەیی بە زمانی کوردی و بە ئەلفبێی کوردی لاتینی، چاپ و بڵاو بکاتەوە؛ بۆ ئەوەی کوردەکانی هەموو پارچەکانی کوردستان سوودی لێ وەربگرن و وەکو ڕێگەچارەیەک و تیۆرییەکی ڕزگاربوون لەژێردەستی، بەکاری بهێنن. هۆکارێکی تری لاتینی ئەوە بووە کە مامۆستا (جەمال نەبەز) وەک پێشەنگی هزری نەتەوەی کوردی، باوەڕێکی زۆری بە کورد هەبوو، وەک یەک نەتەوە و کوردستان، وەک یەک وڵات و دژی سنوورە دەستکردەکان بوو، کە کوردستانی بەسەر چوار دەوڵەتدا پارچە کردبوو.

---

١ نزیک لەم هەوڵ و ناونیشانە، (عەبدوڵڵا گۆران ١٩٠٥-١٩٦٢)ی شاعیر، ساڵی ١٩٦١ کتێبێکی (لینین)ی بە ناوی (هەندێ سەرنجی ڕەخنەگرانە لەسەر مەسەلەی نیشتمانی) لە زمانی عەرەبییەوە کردووە بە کوردی و لە چاپخانەی (الوفاء) لەشاری بەغداد چاپ کراوە.
(ڕێکخراوی ڕۆشنبیریی جەمال نەبەز)

بۆ (جەمال نەبەز)ی هزرمەندی کوردپەروەر گرنگ نەبووە چ کەسێک، ڕێکخستنێکی سیاسی، یان هێزێک مافی کورد بچەسپێنێت و کوردستان ڕزگار بکات، لای ئەو سەربەخۆیی لە هەموو نرخ و هەبوونێکی تر گرنگتر بوو.

خواندەڤانی هێژا، بیرۆکە و نووسینەوەی ئەم پەرتووکەی لە بەر دەستتدایە، بۆ ساڵی ١٩١٢ دەگەڕێتەوە، ئەو دەمەی لە دانیشتنێکی کۆمیتەی ناوەندی پارتی کرێکارانی سۆشیال دیموکراتی ڕووسیا (بۆلشەفیکەکان)دا، کە (ڤلادیمێر لینین) بە شێوەیەکی تایبەت لەگەڵ (جۆزێف ستالین) ی ئەندامی نوێی کۆمیتەی ناوەندی کۆبووەوە. ئامانجی تەنها ناسینی ستالین نەبوو، بەڵکو گوێگرتنیش بوو لە تایبەتمەندی و وردەکارییەکانی کێشە نەتەوەییەکانی ناوچەی قەفقاز، کە تێکەڵەیەکی هەمەچەشنی نەتەوە و ئایینەکان پێکدێنێت؛ هەندێکجار تێکەڵەیەک لە هەردووکیان وەک مەسیحییەکانی جۆرجی و ئەرمەنی و ئازەربایجانیی موسڵمان، داغستانی و چیچانی. لینین، بە زانیارییەکانی ستالین سەرسام بوو و پێشنیازی کرد بچێتە ڤیەنا، لەوێ، (نیکۆلای بوخارین) کە نەمساوی بوو، یارمەتی بدات بۆ دەستەبەرکردن و وەرگێڕانی ئاماژەکان بۆ لێکۆڵینەوەیەک لەسەر پرسی نەتەوەیی. ستالین لە نێوان کۆتاییەکانی ساڵی ١٩١٢ تا سەرەتای ساڵی ١٩١٣ لە ڤیەننا ئەم ئەرکەی تەواو کرد و لێکۆڵینەوەکە لەلایەن

لینینەوە پێداچوونەوەی بۆ کراو و سەرەتا لە ساڵی ١٩١٣ لە گۆڤاری Prosveshcheniye (ڕۆشنگەری)دا بڵاوکراوەتەوە و هەڵوێستی بەلشەفییەکانی لەبارەی نەتەوەکان و مافی چارەی خۆنووسین و سەربەخۆیی کولتوورییەوە خستووەتە ڕوو. پشان وەک نامیلکە و پەرتووک لەژێر ناوی جیاواز و بە چەندین زمان چاپ و بڵاو کرایەوە وەک: (پرسی نەتەوەیی و سۆشیال دیموکراسی)، یان (پرسی نەتەوەیی و لینینیزم)، بەڵام بەرهەمە سەرەکییەکە لە بنەڕەتدا بەم ناونیشانەیە (مارکسیزم و پرسی نەتەوەیی).

لێکۆڵینەوەکە بە گشتی لەسەر پرسی (نەتەوە)یە، واتە بە عەرەبی (القومية)، بە ئینگلیزی Nation و لە ناونیشانی چاپی زمانی ئینگلیزییەکەیدا بەم شێوەیە:

The National Question and Leninism. Reply to omrades Meshkov, Kovalchuk, and Others

March 18, 1929. Foreign Languages Publishing House, Moscow, 1954

بە زمانی ئەڵمانیش بووە بە Die nationale Frage und der Leninismus. بەڵام چونکە مامۆستا (جەمال نەبەز) لە زمانی عەرەبییەوە کردوویەتی بە کوردی و ناونیشانی عەرەبییەکە بەم شێوەیە بووە (المسألة الوطنية واللينينية)، مامۆستا وەک ئەمانەتێکی زانستی وشەی (الوطنية)ی بە (نیشتمانی) وەرگێراوە، کە خۆی لە زمانی کوردیدا هەر

ئەو واتایە دەدات؛ لەبەرئەوە ناونیشانەکە بووە بە (لینینیزم و مەسەلەی نیشتمانی)، بەڵام وەک لە چاپە ڕەسەن (ئۆرگینال)ـەکە و زمانەکانی تردا هاتووە، هەروەها لەبەر ئەوەی لە ناوەڕۆکەکەیدا بە ئاشکرا و بە ڕوونی دەردەکەوێت، ناونیشانی پەرتووکەکە دەبێتە (لینینیزم و مەسەلەی نەتەوەیی). هەر لە ناوەڕۆکی نامیلکەکەدا مامۆستا وشەی ئینگلیزی (ناسیۆن: Nation)ی بەکاری هێناوە.

ناوەڕۆکی نامیلکەکە دابەش بووە بەسەر چوار تەوەردا: (ناسیۆن، پەیدابوونی ناسیۆن و گۆڕانیان، پاشەڕۆژی ناسیۆنەکان و زمانە نیشتمانییەکان، سیاسەتی پارتی لە مەسەلەی نیشتمانیدا).

جوزێف ستالین تێزەکەی لەیەک ڕستەدا کورت کردووەتەوە و دەڵێت: نەتەوە بریتییە لە کۆمەڵگەیەکی مێژوویی پێکهێنراو و سەقامگیری مرۆڤەکان، کە لەسەر بنەمای زمانێکی هاوبەش و خاکێکی هاوبەش و ژیانێکی هاوبەشی ئابووریی و مەیلی دەروونی هاوبەش پێکهێنراون، کە لە کولتوورێکی هاوبەشدا خۆی دەردەخات. ستالین پێناسەی نەتەوەی کرد و ڕەخنەی لە ئۆتۆنۆمیی کولتووریی و نەتەوەیی گرت، کە سۆسیال دیموکراتەکانی نەمسا بانگەشەیان بۆ دەکرد. ئەنجامی لێکۆڵینەوەکەی ستالین، نوێنەرایەتی ئەو ڕوانگەی

هەواڵنامەی کتێب

بەلشەفیکی دەکرد کە پرسیارە نەتەوەییەکان لە چوارچێوەی بزووتنەوەی سۆسیالیستی و خەباتی چینایەتیدا چارەسەر بکرێن، بەڵام جەختی لەسەر مافی چارەی خۆنووسینی گەلان کردەوە. دواتر ئەم پێناسەی نەتەوەیە، بە درێژایی سەدەی بیستەم بەسەر بیری بزووتنەوەی کۆمۆنیستی نێودەوڵەتیدا زاڵ بوو، کە خۆی لەم خاڵانەدا دەبینێتەوە:

١- کۆمەڵەیەکی سەقامگیری خەڵکە.

٢- لە ڕووی مێژووییەوە، لەسەر بنەمای هاوبەشی زمان دروست بووە و سەریهەڵداوە.

٣- خاکی هاوبەش.

٤- ژیانی ئابووریی.

٥- ئەو تایبەتمەندییە دەروونییانەی کە لە هاوبەشیی کولتوورییدا دەردەکەون.

پاشان ستالین دەڵێت: هەریەک لەو بەڵگانەی پێشتر ئاماژەمان پێ دا، بەس نییە بۆ پێناسەکردنی چەمکی نەتەوە، ئەگەر بە گۆشەگیری وەربگیرێت؛ جگە لەوەش، نەبوونی هەر کام لەم بەڵگانە، بەسە بۆ ئەوەی نەتەوەیەک واز لە نەتەوەبوون بهێنێت. بەم پێیە، نەتەوەیەک کۆی هەموو ئەم تایبەتمەندییانەی کە ستالین ڕوونی دەکاتەوە وەکو تایبەتمەندییە دەروونییەکان، بە واتایەکی دیکە پێیان

هەولێرنامەی کیبر

دەڵێن، کارەکتەری نەتەوەیی، کە خۆی لە کولتووریکدا دەردەکەوێت کە نەتەوە دەگرێتەوە. کارەکتەری نەتەوەیی، هەمیشە پێدراوێکی جێگیر نییە، بەڵکو لەگەڵ بارودۆخی ژیاندا دەگۆڕێت.

پاشان ستالین چوارچێوەی مێژوویی نەتەوە پێناسە دەکات و دەڵێت: نەتەوە، چەمکێکی مێژوویی ئەبستراکت نییە، بەڵکو چەمکێکی مێژووییە لەسەردەمێکی تایبەتدا، کە سەردەمی سەرهەڵدانی سەرمایەدارییە، پرۆسەی تەسفیەکردنی سیستەمی فیۆدالی و گەشەکردنی سەرمایەداری لە یەک کاتدا، پرۆسەیەکە کە مرۆڤەکان تێیدا یەکدەگرنەوە و دەبنە نەتەوە. پێناسەی ستالین بۆ نەتەوە، پەیڕەوی لەو جیاکارییە دەکات کە (کارل مارکس) و (فریدریش ئەنگڵس) لە نێوان دەستەواژەی (نەتەوە) و (نەتەوەبوون)دا کردوویانە، کە مارکس و ئەنگڵس زاراوەی یەکەم بەکاردەهێنن بۆ ئاماژەدان بە خەڵکی دەوڵەتێکی سەروەر، لە کاتێکدا دووەمیان، ئاماژەیە بۆ (گەلانی نامێژوویی) کە زمان و پاشخانێکی هاوبەشیان هەیە، بەڵام دەوڵەتێکیان نییە.

هەرچەندە ئەم پەرتووکە پێش ٧٠ ساڵ وەرگێڕراوە و بڵاوکراوەتەوە، بەڵام لە ڕووی زانستییەوە، هێشتا نرخ و گرنگییەکەی لە دەست نەداوە؛ وەک چۆن بۆ ئەو سەردەمە

گرنگ بووە، بۆ ئێستاش وەک بیردۆز (تیۆری)یەکی سیاسی و ئەکادیمی بۆ چارەسەری کێشەی ئەو نەتەوانەی وەکو کورد، کە تا ئێستا بندەستن، زۆر گرنگە و کورد وەک نەتەوە لە بواری هزر و ڕێکخستنی سیاسیدا، بە درێژایی مێژوو قازانجی لێی وەرگرتووە.

**د. سالم جاسم حاجی**

**کوردستان – دهۆک**

**٢٠٢٦**

هەواڵنامەی کتێب

هەوالنامەی کتێب

# چیرۆکی دۆزینەوەی ئەم کتێبە

ساڵانێکی زۆر مامۆستا جەمال نەبەز و پاشانیش (ڕێکخراوی ڕۆشنبیریی جەمال نەبەز)، عەوداڵی ئەم کتێبە بووین، تاکو جارەکی دی چاپی بکەینەوە.

ساڵی ١٩٥٦، مامۆستا جەمال نەبەز، بەسەردانێک دەچێتە ڕۆژئاوای کوردستان بۆ شاری دیمەشق، لەوێ نووسەری نێوداری کورد ئاپۆ (عوسمان سەبری) دەناسێت. ئەم ناسینە دەبێتە هۆی ئەوەی هەردووکیان هەوڵ دەدەن لە ڕێگەی نووسین و زمانی کوردییەوە، خزمەت بە دۆزی ڕەوای گەلی کورد بکەن. لەو ماوەیەدا، مامۆستا (جەمال نەبەز)، دوو کتێب دەنووسێت:

١ - یەکەم: بەرخۆدانی کوردەکان (كفاح الاكراد)، بەنێوی (صامد الكردستاني) ١٩٥٦، دیمەشق.

٢ - دووەم: (لینینیزم و مەسەلەی نیشتمانی)، وەرگێڕانی لە عەرەبییەوە بۆ تیپی کوردیی لاتینی بەنێوی کورتکراوەی (ن. ت)، ١٩٥٦، دیمەشق.

مامۆستا (جەمال نەبەز)، ئەم کتێبە لەسەر داوای ئاپۆ (عوسمان سەبری) وەردەگێڕێ و هەر لەوێ لەڕێگەی

هەواڵنامەی کتێب

هاوڕێکانی ئاپۆ (عوسمان سەبری)یەوە لە چاپخانەی (کەرەم) لە چوارچێوەی ٥٠ لاپەڕەدا، بە نهێنی چاپ و بڵاویدەکاتەوە.

مامۆستا (مستەفا نەریمان) لە کتێبی ببلیۆگرافیاکەیدا[١] ئەم کتێبەی بەناوی دکتۆر جەمال نەبەزەوە تۆمار کردووە و نووسیویەتی (ن. ت: واتە نەبەز تۆفیق – دکتۆر جەمال نەبەز) ئـەوەی جێگەی دڵخۆشییە مامۆستا جەمال نەبەز لەزووربەی بەرهەمەکانیدا، لەبەشی کتێبە چاپکراوەکانیدا، ئـەم کتێبەی تـۆمـارکـردووە. ژبەرهەندێ ئێمە دڵگەرمانە هەواڵمان دەدات تاکو ئەم کتێبەمان دەستکەوێت.

لەسەرەوەختی ئامادەکردنی (بیبلیۆگرافیای جەمال نەبەز) دا، لەگەڵ برایانی هێژامان (بـوار نـوورەدیـن) و (جەمال نـــوری)دا ئـەم کتێبەمان تـۆمـارکـردووە. بـەڵام بەهۆی ئەوەی کتێبەکەمان لەبەردەستدا نەبوو، نەمانتوانی بەرگی کتێبەکە بڵاوبکەینەوە. لەدوای کنە و گەڕانێکی زۆر، لەگەڵ هاوڕێی ئازیزم (جەمال نـوری)دا، لە کۆڕێکی زمانەوانیی مامۆستا (فـەرەیـدوون سـامـان)دا، خۆشبەختانە گەنجێکی خوێنگەرم هاتە لامـان و پێی وتـین: کتێبی (لینینیزم و مەسەلەی نیشتمانی)، لەلای کەسێک هەیە کوردی ڕۆژئاوای

١ بڕوانە: ببلیۆگرافیای دووصەد ساڵی کتێبی کوردی ١٧٨٧ – ١٩٨٦، مصطفی نەریمان، دەزگای ڕۆشنبیری ڕۆشنبیری و بڵاوکردنەوەی کوردی، زنجیرەی ژمارە ٢٢٨، مطبعة الجاحظ، بغداد، ١٩٨٩، ڕیزبەندی تیپی (ل)، پەراوێزی لاپەڕە ٢٦٢. (ڕێکخراوی ڕۆشنبیریی جەمال نەبەز).

کوردستانە و ئێستا لە سوید دەژی. جارەکی دی دیسانەوە بەبێ ماندووبوون، دەستمان کردەوە بە گەڕان و سۆراخی کتێبەکە؛ تاکو خۆشبەختانە توانیمان لەڕێی مامۆستای هێژامان (فرات جەوەری)[١] یەوە کتێبەکەمان دەست بکەوێت. لەڕێی مەسنجەرەوە نامەیەکمان بۆ نووسی و مامۆستا فرات، بە لوتفی کوردانەوە وەڵامی داینەوە. ئای خودایە چەند دڵخۆش بووین کاتێک مامۆستا فرات فەرمووی (بەڵێ ڕاستە، ئەم کتێبە لەلای منە و لە ساڵی ١٩٨٧ ـەوە هەڵمگرتووە و کاتی خۆی خاتوو «ڕەوشەن بەدرخان» بەدیاریی پێی داوم تاکو بیپارێزم). سوپاسی دەکەین، خێرا پێی وتین: هەر کەسێک دەنێرن بابێت کتێبەکەی پێ دەدەم. ئیدی داوامان لە مامۆستای(چالاک محەمەد) کرد تاکو بچێتە لای مامۆستا فرات بۆ لەبەرگرتنەوەی کتێبەکە. خۆشبەختانە لەماوەی چەند ڕۆژێکدا کتێبەکە گەیشتە دەستمان. لەکانی دڵمانەوە سوپاسی مامۆستایان (فرات جەوەری) و (چالاک محەمەد) دەکەین بۆ دەستخستنی ئەم کتێبە بەبایەخە. هەزاران چەپکە

١ فرات جەوەری Firat Cewerî: لە نامەیەکیدا بۆ نووسەر، بەم جۆرە ئاماژە بەم بابەتە دەکات: کاک دەوەن، هیوادارم تۆ باش بیت... کتێبی لینینیزم و مەسەلەی نیشتمانی، ساڵی ١٩٨٧ کاتێک من بۆ پەیداکردنی ژمارەکانی گۆڤاری هاوار لە سویدەوە چووم بۆ سوریا و میوانی ڕەوشەن بەدرخان بووم، ئەو ئەم کتێبەی دامێ. وا ٤٠ ساڵە کتێبەکە لە ئەرشیفی مندا پارێزراوە. بەداخەوە من لەمە زیاتر شتێکی ترم نییە لەسەر کتێبەکە بیڵێم. بەو هیوایەی ئەمجارە لە سلێمانی یەکدی ببینین. لەگەڵ سڵاوێکی گەرم (فرات جەوەری)

گوڵی ڕەنگاوڕەنگیش بۆ یاد و یادەوەریی خاتوو (ڕەوشەن بەدرخان)، کە کتێبەکەی لەلای خۆی پاراست بوو.

ئەم کتێبە بەنرخە، لەلایەن شاعیر و وەرگێڕ (ساڵح بێچار) ەوە لە ئەلفبێی ڕێنووسی لاتینییەوە وەرگێڕاوە بۆ ئەلفبێی ڕێنووسی ئارامی. سوپاسی دەکەین وەرگێڕانێکی ورد و جوانی بۆ کردووە. سوپاسی دکتۆر(سالم جاسم) دەکەین لەسەر داوای ڕێکخراو پێشەکی بۆ کتێبەکە نووسیوە. هەروەها سوپاسی هونەرمەندی شێوەکار (ڕۆستەم ئاغالە) دەکەین کە یەکێک لە تابلۆکانی خۆی پێشکەش کردین بۆ بەرگی کتێبەکە. سوپاسی هاوڕێیان و دۆستانمان دەکەین کە هاوکارمان بوون بۆ ئەم ئەرکە پیرۆزە، بەتایبەتی مامۆستا ڕێبوار حەمەتۆفیق کە دڵسۆزانە هەمیشە لە خەمی کارەکانماندایە. جارێکیتر پیرۆزە لە ڕۆحی پاکژی مامۆستا جەمال نەبەز.

**ڕێکخراوی ڕۆشنبیریی جەمال نەبەز**
**کوردستان – سلێمانی**
**٢٠٢٦**

# لینینیزم و
# مەسەلەی نیشتمانی

هەواڵنامەی کتێب

له وەرگێڕەوە:

ئەم نامیلکەیەی ستالین کە کراوە بە کوردی، لەسەر تەرجەمەی عەرەبی بەرگی (١١)ـەی کۆمەڵە نووسراوەکانی ستالینەوە وەرگیراوە، کەوا عەرەبییەکەی لەلایەن (ئامۆژگای مارکس – ئەنگلس – لینین – ستالین)ـەوە ئامادە کراوە، کە ئەویش ئامۆژگایەکە سەر بە لیژنەی ناوەندی پارتیی کۆمۆنیستی یەکێتیی سۆڤیەتە.

هەواڵنامەی کتێب

نامەکەتانم پێگەیشت، بە تـەواوی لـەو کۆمەڵە نامانە دەچـوو[١] کە هەر لەم بابەتەوە لەم چەند مانگەی دوایدا لە هاوڕێکانی ترەوە بۆم هاتووە. بەڵام من بڕیارم دا کە هەر تەنها وەرامـی ئێوە بدەمەوە، چونکە ئێوە کاتێک کە مەسەلەکان دەخـەنـەڕوو، سـەروبـۆرییـش بـۆ وشەکانی دادەنێن و بەم جۆرە دەبنە هۆی ئاشکراکردنی باسەکە. بە ڕاستی ئێوە لە نامەکانتاندا بە جۆرێکی ناڕاست بۆ چارکردنی مەسەلە دەچن. بەڵام ئەوە باسێکی ترە وا لێرەدا قسەی لێ دەکەین.

جا با ئێستە بێینە سەر مەسەلەکە:

## یەکەم: ناسیۆن[٢]

زۆر دەمێکە مارکسیستە ڕووسەکان تیۆری[٣] تایبەتی خۆیان هەیە بەرامبەر بە (ناسیۆن). ناسیۆن بە پێی ئەم تیۆرییە، کۆمەڵە خەڵکێکی نیشتەجێیە و بە جۆرێکی مێژوویی پێک هاتووە و لەسەر بنچینەی بەشداربوون لە هەر چوار

١ لە وەرگێڕانەکەی مامۆستا (جەمال نەبەز)دا، نیشانەی ڕانەبردووی کار بە (ئە) ئاماژەی بۆ کراوە.
٢ ناسیۆن: أمة (ج. ن).
لە کۆتایی هەر پەراوێزێکی ئەم کتێبەدا نووسرابوو (ج. ن)، مەبەست لەوەیە کە مامۆستا (جەمال نەبەز) ئەو ڕوونکردنەوەیەی نووسیوە. (ڕێکخراوی ڕۆشنبیریی جەمال نەبەز)
٣ تیۆر: نظریة (ج. ن)

نیشانە بنچینەییەکەی خوارەوەدا پەیدا بووە، لەسەر بنچینەی یەکێتیی زمان و یەکێتیی زەمین و یەکێتیی ژیانی ئابووری و یەکێتیی پێکهاتنی گیانی کەوا لەو سروشتانەدا دەردەکەوێ کە پێی دەوترێ کولتووری[1] نیشتمانی. وەک ئاشکرایە ئەم تیۆرییە هەموو لایەک لە پارتەکەماندا دانی پیا ناوە.

وەک لە نامەکانتدا دەردەکەوێ، ئەم تیۆرییە بە ناتەواو دەدەنــە قـەڵـەم. لـەبـەر ئـەوە پێشنیارتان وایـە کـە چـوار نیشانەکەی ناسیۆن، نیشانەیەکی پێنجەمینی بخرێتە سەر. مەبەستیشمان بوونی دەوڵەتێکی خۆیی و جیاوازە. ئێوەش واتان داناوە کە ئەگەر ئەم نیشانەی پێنجەمە نەبێت، ناسیۆن نەهاتووەتە بوون و هیچ بوونیشی بۆ نییە.

من پێم وایە ئەو نەخشەیەی کە ئێوە بە پێشنیار دەیدەن بە خۆی و نیشانەی تازەی پێنجەمی نێوە بۆ مانای (ناسیۆن) هەڵەیەکی یەکجار زلە، هەروەها نە بەشێوەیەکی تیۆرییانە و نە لەباری پراکتیکی (واتا سیاسییەوە) دەتوانرێ پاکانەی بۆ بکرێ.

بە پێی نەخشەکەتان دەبێ تەنها دان بەو ناسیۆنانەدا بنێین کە وا دەوڵەتی خۆیی و جیاوازیان هەیە لە خەڵکی تر، کە ناسیۆنن بەڵام هەموو ناسیۆنە زۆر لێکراوەکان و لە دەوڵەتی سەربەخۆ بێبەش کراوەکان دەبێ لە ڕیزی

---

١ کولتوور: ثقافة (ج. ن)

ناسیۆنەکان لایانبەرین، هەروەها تێکۆشانی ناسیۆنە زۆرلێکراوەکان بەرامبەر بە زۆرداریی نیشتمان و تێکۆشانی گەلە ژێردەستەکان بە پێچەوانەی ئیمپریالیزمەوە پێویستە لە مانای (بزووتنەوەی نیشتمانی) و (بزووتنەوەی نیشتمانی ڕزگاریخوازانە) جیابکەینەوە. بێجگە لەوەش بەپێی نەخشەکەتان، دەبێ بڕیار بدەین کە:

(ا) ئیرلەندییەکان نەبوونە ناسیۆن، جگە پاش دامەزراندنی (دەوڵەتی ئیرلەندی سەربەست) نەبێ، بەڵام لە پێش ئەوەدا ناسیۆنیان پێک نەدەهێنا.

(ب) نەرویجییەکان ناسیۆن نەبوون بەر لەوەی نەرویج (نەرویژ) لە سوید جیا ببێتەوە و نەبوونە ناسیۆن، جگە پاش ئەم جیابوونەوەیە نەبێت.

(پ) ئۆکرانییەکان ناسیۆن نەبوون کاتێک کە ئۆکرانیا پارچەیەک بوو لە ڕووسیای قەیسەریی و نەشبوونە ناسیۆن، جگە پاش جیابوونەوەیان نەبێ لە ڕووسیای سۆڤیەتی لە زەمانی دەسەڵاتی (ڕادا)ی[1] ناوەندی و فەرمانڕەوایی ئەسکۆرۆپادسکیدا، بەڵام سەرلەنوێ لە ناسیۆن چوونەوە پاش ئەوەی جمهورییەتە ئۆکراینییە سۆڤیەتییەکەیان لەگەڵ

---

١ لە مێژووی ڕووسیا و یەکێتیی سوڤێتیدا، وشەی (ڕادا – Rada ) وشەیەکی سلاڤییە بە واتای ئەنجومەن یان شورا دێت. کەواتە زەمانی دەسەڵاتی ئەنجومەنەکان یان بە شێوە ناسراوەکەی دەسەڵاتی سۆڤێتی دێت. (ڕێکخراوی ڕۆشنبیریی جەمال نەبەز).

جمهوررییەتەکانی تری سۆڤییەتدا یەکخست لە یەکێتیی جمهوررییەتە سۆسیالستەکانی سۆڤیەتدا.

دەشتوانرێ ژمارەیەکی زۆر لەم جۆرە مەسەلانە بهێنرێنەوە.

جا ئاشکرایە کە نەخشەیەک ئەم جۆرە ئەنجامە پرِوپووچانەی لێ دەربچێ، شایانی ئەوە نییە کە وەک نەخشەیەکی زانیاری بدرێتە قەڵەم.

نەخشەکەتان لە باری پراکتکییەوە (واتا سیاسییەوە) هیچ گومانی تیا نییە دەبێتە هۆی پاکانەکردن بۆ زۆرداریی نیشتمانیی ئیمپریالیزم کە وا ملۆزمەکانی هەرگیز دان بەوەدا نانێن کە ناسیۆنە زۆرلێکراوە بەشخوراوەکان ناسیۆنی راستەقینەن، چونکە ئەمانە دەوڵەتی نیشتمانیی جیاوازیان نییە و وای دادەنێن کە ئەم حاڵە هەقیان دەداتە دەست بۆ چەوساندنەوەی ئەم ناسیۆنانە.

ئیتر هیچ پێویست ناکات کە بڵێم نەخشەکەتان دەبێتە هۆی بەخشینی رەگەزپەرستە بۆرجوازێکانی جمهوررییەتە سۆڤیەتییەکەمان، ئەوانەی کە هەوڵ دەدەن بۆ ئەوەی ئیسپاتی بکەن کە ناسیۆنە سۆڤیەتییەکان لە ناسیۆنی کەوتوون پاش یەکخستنی جمهوررییەتە سۆڤیەتییە نیشتمانییەکانیان لە یەکێتیی جمهوررییەتە سۆسیالیستەکانی سۆڤییەتدا.

ئەوە مەسەلەی (تەواوکەر) و (راستکردنەوە)ی تیۆری

مارکسیانەی ڕووسییە لە بارەی ناسیۆنەوە.

ئیتر لە یەک شت بەولاوە هیچی تر نامێنێ، ئەویش دانپیانانە بە تیۆری مارکسیانەی ڕووسیدا لە بارەی ناسیۆنەوە کەوا تاکە تیۆرییەکی ڕاستەقینەیە.

## دووەم: پەیدابوونی ناسیۆن و گۆڕانیان:

یەکێک لە هەڵە قورسەکانتان ئەوەیە کە هەردووکتان بە یەک چاو دەڕواننە هەموو ئەو ناسیۆنانەی کە ئێستە هەن و هیچ جیاوازییەکی سەرەتایی لە بەینیاندا نابینن. لە جیهاندا گەلێک ناسیۆنی جیاواز هەن. ناسیۆنی وا هەن لە دەوری ڕاپەڕینی سەرمایەداریدا گۆڕانیان بەسەردا هاتووە، کاتێک کە بۆرجوازێتی سەروگوێلاکی دەرەبەگی دەکوتایەوە و پەرت و بڵاویی دەرەبەگی لەناودەبرد و گشت لایەکی ناسیۆنی کۆدەکردەوە و بەیەکییەوە دەلکاند. ئەمە ئەوەیە کە ناوی ناسیۆنی (نوێ)ی بەسەردا بڕاوە.

ئێوە وادەزانن کە ناسیۆن هەر بووە و دەرکەوتووە هەتاوەکو لە پێش سەرمایەداریشدا. بەڵام چۆن دەبێ دەرکەوتبێ و بووبێت لەپێش سەرمایەداریدا، لە دەوری دەرەبەگیدا، کاتێک کە وڵاتان بەش بەش کراون بە چەند میرنشینێکی سەربەخۆی لە یەک جیاواز ئەوە کە بە شیرازەی نیشتمانییەوە بەیەکەوە بەند نەکرابوون، بەڵکو

لەسەر ئەوەشەوە، زۆر بە توندی نەفرینیان لە پێویستی ئەو شیرازانە دەکرد. ناسیۆن بە پێچەوانەی قسە ناڕاستەکانی ئێوەوە هەرگیز نەبووە و نەشیاوە ببێ لە هیچ دەورێکی پێش سەرمایەداریدا، چونکە بازێڕی نیشتمانی هێشتا نەبووە، هەروەها ناوچەی ئابووریی و کولتووریی و نیشتمانی نەبووە، لەبەر ئەو هۆیانەی، کە دەشێ پەرت و بڵاوی ئابووریی میللەتێکی ناسراو لەناوببا و لە هەموو نیشتمانێکدا چەند بەشێک کۆبکاتەوە، کە هێشتا پارچە پارچەیە، ئەو هۆیانە هێشتا نەهاتوونە بوون.

شتێکی دیارە کە ڕەگەزەکانی ناسیۆن، مەبەستیشمان لە یەکێتیی زمان و زەمین و کولتوور و هتد ...! لە ئاسمانەوە نەکەوتووەتە خوارەوە، بەڵکو بەرە بەرە لە دەوری پێش سەرمایەداریدا پەیدا بووە. بەڵام ئەم ڕەگەزانە ئەو حەلە هێشتا لە شێوەی گەرادا بوون و لە چاکترین دۆخیدا چ نەبوون جگە سەرەتایەک نەبێت بۆ دامەزراندنی ناسیۆن، واتا توانای دامەزراندنی لە پاشەڕۆژدا لە کاتی پەیدابوونی زورووفی گونجاوی ناسراودا. ئەم توانایەش نەبووە شتێکی ڕاستەقینە جگە لە دەوری ڕاپەڕینی سەرمایەداری و بازێڕە نیشتمانییەکەی و ناوچە ئابووریی و کولتوورییەکانیان نەبێت.

جا بەم بۆنەیەوە پێویستە لەسەرمان دەستێک ڕابکێشین بۆ وشە بەرزەکانی لینین لە بارەی مەسەلەی پەیدابوونی

ناسیۆنەکانەوە، کە لە ناملیکەی ناوبراویدا بە (ئەوانە هاوڕێی گەل نین) و چۆن لەگەڵ سۆسیالیستە دیمۆکراتییەکاندا دەجەنگێن؟ باسی کردووە، لینین لەکاتی دەمەتەقێکردنیدا لەگەڵ میخایلۆڤسکی[1] گەلپەرست، کە پێی وابووە پەیدابوونی پەیوەندیی نیشتمانی و یەکێتیی نیشتمانی ئەنجامی گۆڕانی پەیوەندی هۆزایەتییە، ئەمەی خوارەوەی گوتووە:

کەواتە پەیوەندییە نیشتمانییەکان درێژبوونەوە و پەرەسەندنی پەیوەندییە هۆزایەتییەکانن! ئاشکرایە کاک میخایلۆڤسکی باری سەرنجی خۆی بەرامبەر بە مێژووی کۆمەڵ لەو چیرۆکە منداڵانەیەوە وەردەگرێ کەوا قوتابییەکان بە دەرس دەیخوێنن. مێژووی کۆمەڵ، بە پێی ئەم بیروباوەڕە بێسەر و پێیە، بەکورتی ئەوەیە کە هەر لەسەرەتاوە خێزان بووە، کە خێزانیش شانەی هەموو کۆمەڵێکە... پاشان خێزان گەشەی کردووە، بە خەیاڵی ئەو و بووە بە هۆز، بەڵام کە هۆز گەشەی کردووە بووە بە دەوڵەت. جا ئەگەر کاک میخایلۆڤسکی بە فیزێکەوە ئەم گڕوگاڵە منداڵانەیە بڵێتەوە، دیارە ئەوە چ نییە جگە بەڵگەیەک نەبێ، لەپاڵ گەلێک بەڵگەی تـرا، بۆ ئـەوەی کە هیچ جۆرە زانستییەکی نییە تەنانەت

---

[1] نیکۆلای میخایلۆڤسکی Nikolay Mikhaylovsky (١٨٤٢–١٩٠٤): لە دیارترین ڕەخنەگر و کۆمەڵناسە ڕووسەکانی سەدەی نۆزدەیە؛ هەروەها یەکێکیشە لە تیۆریستەکانی بزووتنەوەی گەلپەرستی ڕووسی.
(ڕێکخراوی ڕۆشنبیریی جەمال نەبەز).

لەبارەی بەسەرهاتی مێژووی ڕووسیاوە. خۆ ئەگەر بتوانرێ قسە لە ناوچەی هۆزایەتی بکرێ لە ڕووسیای کۆنا، هیچ گومانی تیا نییە کە ئەم پەیوەندییە هۆزایەتیانە نەبوو و هەتاوەکو لە سەدەکانی ناوەڕاستیشدا، واتا لە دەوری سەڵتەنەتی مۆسکۆدا، مانای ئەوەش وایە کە دەوڵەت لەسەر بنچینەی یەکێتییەک دروست بووە کە هەرگیز هۆزایەتی نەبووە، بەڵکو شتێکی ناوخۆیی بووە واتا مڵکدارە گەورەکان و موتەوەلی کڵێسەکان ڕەنجبەریان لە گشت لایەک وەر ئەگرت و ئەو مەشاییاتانەی کەوا بەم جۆرە پێک هاتبوو یەکێتییەکی زەمینیانەی ڕۆوت بوو. لەگەڵ ئەوەشدا نەدەگونجا لەو دەورەدا باس لە پەیوەندی نیشتمانی بکرێ بە مانای تایبەتی وشە، چونکە دەوڵەت بەش بەش بووبوو بۆ چەند پارچە زەوییەک، بگرە هەتاوەکو هەندێ جار، بۆ چەند میرنشینێکی لە یەک جیا کەوا هەریەکە شوێنەوارێکی زیندووی حوکمی خۆیی پێشوو و سروشت حوکمی ئیداری پێوە دیار بوو، هەندێ جار بە لەشکری تایبەتییەکەیەوە (بۆ یارە ناوخۆییەکان بە لەشکری تایبەتی خۆیانەوە دەچوونە شەڕ) و سنووری گومرگی خۆیان هەبوو و هەروەها. مەگەر دەوری تازە بڵێت لە مێژووی ڕووسیا (ئەویش لە نزیکەی سەدەی هەڤدەمینەوە) کەوا بە چەشنێکی ڕاست هەموو ئەم قەڵەمڕەو و زەوی و میرنشینانە چوونە ناو یەک، چوونە

ناو یەکێکی ڕاستەقینە و بوونە تاکە یەکێک. ئەم چوونە ناو یەکەش سەبارەت بە پەیوەندی هۆزایەتی نەبوو جەنابی کاک میخایلۆڤسکی، هەتاوەکو سەبارەت بە درێژبوونەوە و پەرەسەندنیش نەبوو، بەڵکو سەبارەت بە ئاڵووگۆڕی ڕوو لە زیادی شتوومەک بوو لە بەینی ئەم قەڵەمڕەوانەدا و زیدبوونی لەسەر خۆی هێنان و بردنی کوتاڵ و ڕەگداکوتانی بازاڕی ناوخۆی بچکۆلە بوو لە بازاڕکی تاکوتەنهادا بۆ گشت ڕووسیا و لەبەر ئەوەی ئاڕاستەکەران ئەم ڕۆیشتنە و دەستبەسەراگرانی بازرگانە سەرمایەدارەکان بوون، دیارە دامەزراندنی ئەم پەیوەندییە نیشتمانییانە لە دامەزراندنی پەیوەندی بۆرجوازی بەو لاوە هیچی تر نەبوو. (تەماشای بەرگ: ١، ل: ٧٢-٧٣ بکە) ئەوە بوو مەسەلەی پەیدابوونی ئەوەی پێی دەوترێ ناسیۆنی (نوێ).

بۆرجوازییەتی و پارتە ڕەگەزپەرستەکانی هەتا ئێستەش لەم دەورەدا، هەر هێزی پێشڕەوی سەرکردەیی ئەم ناسیۆنانە بوو. بەڵام پەیژەی چینایەتی لەناو ناسیۆنا بۆ پێکهێنانی یەکێتیی ناسیۆن و فراوانکردنی زەوی لەلایەن ناسیۆنەوە لە ڕێگەی داگیرکردنی زەوی نانیشتمانی و باوەڕنەبوون و قینەبەرایەتی بەرامبەر بە ناسیۆنانی بێگانە و دەمکوتکردنی کەمایەتییە نەتەوایەتییەکان و یەکگرتنی لە بەرەیەکدا لەگەڵ ئیمپریالزم، ئەوە دەبێتە خۆراکی مێشک و

کۆمەڵایەتی و سیاسی ئەم ناسیۆنانە.

ئەم چەشنە ناسیۆنانە دەبێ بە جۆرێک ڕیز بکرێن وەک ناسیۆنانی بۆرجوازی لەوانەش وەکو ناسیۆنی فەرەنسی و ئینگلز و ئیتاڵی و ناسیۆنی ئەمەریکای ژووروو و گەلێک ناسیۆنی تر کەوا لەوانە دەچن و لە ڕەنگی ئەوانە ناسیۆنی ڕووسی و ئۆکرانی و تەتەری و ئەرمەنی و جۆرجی و گەلێک ناسیۆنی تری ڕووسیا کە وەختی خۆی ناسیۆنی بۆرجوازی بوون بەرلەوەی دیکتاتۆری پرۆلیتاریا جێگر ببێ و ڕژێمی سۆڤیەت لە وڵاتەکەماندا ڕەگ دابکوتێ، ئاشکرایە کە چارەنووسی ئەم ناسیۆنانە، بەستراوە بە چارەنوسی سەرمایەدارییەوە، مانای وایە لەگەڵ ڕووخانی سەرمایەداری، دەبێ ئەم ناسیۆنانە لەسەر شانۆ نەمێنن.

نامیلکەکەی ستالین (مارکسیزم و مەسەلەی نیشتمانی) ئەم ناسیۆنە بۆرجوازییانە دەگرێتە بەرچاو کاتێک دەڵێ (ناسیۆن تەنها وتەیەکی مێژوویی نییە، بەڵکو وتەیەکی مێژووییە بۆ دەورێکی ناسراو ئەویش دەوری سەرمایەداریی ڕوو لە بەرزییە). و (چارەنووسی بزووتنەوەی نیشتمانی، بە خۆی و دەروونـە بۆرجوازییەکەیەوە، بە وێنەیەکی سروشتی بەستراوە بە چارەنوسی بۆرجوازێتییەوە) و (ڕووخانی دوایی بزووتنەوەی نیشتمانی نایەتەدی جگە لەگەڵ ڕووخانی بۆرجوازێتی نەبێت) و (ئاشتی بنبەست نابێ بە تەواوی جگە

لە دنیای سۆسیالیزمدا نەبێت).

ئـەوەیـە مـەسـەلـەی ناسیۆنە بـۆرجـوازیـیـەکـان. بـەڵام هەندێ ناسیۆنی تریش هەن لە جیهاندا. ئەوانەش ناسیۆنە تازەکانی سۆڤیەتن، کەوا بەرەو گۆڕان و پێگەیشتن دەڕۆن لەسەر بنچینەی ناسیۆنە بۆرجووازییە کۆنەکان، پاش ڕووخانی سەرمایەداری لە ڕووسیادا و پاش دەرکێشانی ڕیشەی بۆرجوازییەتی و پارتە ڕەگەزپەرستەکانی و پاش جێگیربوونی ڕژێمی سۆڤییەت.

چینی کرێکار و پارتە ئینتەرناسیۆنالیستەکەی[1] ئەو دوو هێزە پێکدێنن کەوا ئەم ناسیۆنە تازانە بە یەکەوە ئەلکێنێ و پێشڕەوییان ئەکات. شوێنەواری[2] گیانی و کۆمەڵایەتی و سیاسی ئەم ناسیۆنانە: یەکگرتنی چینی کرێکار و جووتیارە زەحمەتکێشەکانی نـاو نـاسـیـۆنـە، بـۆ ڕیشەکێشکردنی سەرمایەدار بەناوی دامەزراندنی سۆسیالیزم سەرکەوتووەوە، پاشان لەناو بردنی شوێنەواری زۆرداریـی نیشتمانییە بەنـاوی چونیەکی و گـۆڕانـی ناسیۆنەکان و کەمایەتییە نەتەوایەتییەکانەوە گۆڕانێکی سەربەست، دوای نەهێشتنی پاشماوەی ڕەگەزپەرستییە بەناوی جێگیرکردنی دۆستایەتی لە بەینی گەلاندا و بنبەستکردنی ئنتەرناسیۆنالیستییە، پاشان

١ ئینتەرناسیۆنالیست: أممي (ج. ن)
٢ شوێنەوار: اثر (ج. ن)

دامەزراندنی بەرەیەکی یەکگرتووە لەگەڵ هەموو ناسیۆنە زۆرلێکراوە بەشخوراوەکان، بۆ تێکۆشان بە پێچەوانەی سیاسەتی هەڵکوتانەسەر و جەنگی داگیرکردن و بۆ تێکۆشان بە پێچەوانەی ئیمپریالیزمەوە.

ئەم چەشنە ناسیۆنانە دەبێ بەو پێیە ڕیز بکرێن کە ناسیۆن سۆسیالیستن. ئەم ناسیۆنە تازانە لەسەر بنچینەی ناسیۆنە بۆرجوازییە کۆنەکان دەرکەوتن و گۆڕان لە ئەنجامی ڕیشەکێشکردنی سەرمایەداری و لە ڕێگەی سەر هەڵدانەوەیان بە گیانێکی سۆسیالیزمییەوە. کەس ناتوانێ بڵێ ئەم ناسیۆنە سۆسیالیستیانەی ئێستەی یەکێتیی سۆڤیەت، واتا ناسیۆنی ڕووس و ئۆکرانی و بەلەڕووسی و تەتەری و باشکیری و ئۆزبەکی و قازاخ و ئازربایجان و جۆرجی و ئەرمەن و گەلێ ناسیۆنی تر، جیاوازییەکی بنچینەییان هەیە لەگەڵ ناسیۆنە کۆنەکان، واتا لەگەڵ ئەو ناسیۆنانەی کەوا لەگەڵ بۆرجوازیەتیدا دانوویان دەکولا لە ڕووسیای کۆنا و لە یەکتریش جیاوازبوون، سائیتر لەڕووی پێکهاتنی چینایەتی و ڕوخسار مەعنەوییەوە بێ، یان لەڕووی دەسکەوت و هەوڵدانی سیاسی و کۆمەڵایەتییەوە بێ، ئەوە باسی دوو چەشنە ناسیۆن بوو کە دەورەکانیان هەر مێژوو بوو.

ئێوە هەردووکتان لەسەر ئەم کارە پێک نایەن، ئەویش ئەوەیە کە چارەنووسی ناسیۆنەکان و لەم مەیدانەدا

ناسیۆنە بۆرجوازییە کۆنەکان، ببەستریٚ بە چارەنووسی سەرمایەدارییەوە. هەروەها هەردووکتان پیٚکنایەن لەسەر ئەو باسەی کە دەڵیٚ: بە نەمانی سەرمایەداری ناسیۆنە بۆرجوازییە کۆنەکان نامیٚنن. ئەی کەواتە چارەنووسی ئەم ناسیۆنانە دەبیٚ بە چییەوە ببەستریٚ ئەگەر بە چارەنووسی سەرمایەدارییەوە نەبەستریٚ؟ ئایە شتیٚکی ئەوەندە گرانە تیٚبگەین کە لەگەڵ پیٚچانەوەی دەوری سەرمایەداری دەبیٚ دەوری ناسیۆنە بۆرجوازییەکانیش، کە بیٚچووی سەرمایەدارین بپیٚچریٚتەوە؟ ئایە ئیٚوە بڕواتان نییە کە ناسیۆنە بۆرجوازییە کۆنەکان دەتوانن ببن و بگۆڕیٚن لە سای سیٚبەری ڕژیٚمی سۆڤیەتی و لە سای سیٚبەری دیکتاتۆریی پرۆلیتاریدا؟ لە هیچمان کەم نەبوو لەوە نەبیٚ...

ئیٚوە لەوە دەترسن کە نەمانی ئەو ناسیۆنانەی کە لە دەوری سەرمایەداریدا هەن، شانبەشانی نەمانی گشت ناسیۆنەکان بیٚت، واتا شانبەشانی نەمانی هەموو ناسیۆنیٚک بیٚ. بۆچی و بە چ بەڵگەیەک؟ ئایە ئیٚوە بەڕاست ئەوە نازانن کە بیٚجگە لە ناسیۆنە بۆرجوازییەکان، ناسیۆنی ترش هەن، ناسیۆنی سۆسیالیستی وا کە زۆر یەکدگیرتر و زندووتر، بە جۆریٚک لەگەڵ هیچ ناسیۆنیٚکی بۆرجوازی ناپیٚورریٚن؟

ئەوە هەڵەکەتانە بەتایبەتی، چونکە ئیٚوە لە ناسیۆنی بۆرجوازی بەولاوە ناسیۆنی تر ناهیٚننە بەرچاو، لەبەرئەوە

چاوتان گەلێ کزتر بووە لەوەی کە سەدەیەک بە تەواو ببینن، سەدەی پەیدابوونی ناسیۆنە سۆسیالیستەکانی یەکێتیی سۆڤیەت کە لەسەر تەپۆڵکەکانی ناسیۆنە بۆرجوازییە کۆنەکانەوە هەڵقوڵاون.

ئائەوەیە مەسەلەکە، چونکە نەمانی ناسیۆنە بۆرجوازییەکان، مانای نەمانی گشت ناسیۆنەکان نییە بە جۆرێکی تێکڕایی، بەڵکو مانای نەمانی ناسیۆنە بۆرجوازییەکانە و هیچی تر. جا لەسەر تەپۆڵکەکانی ناسیۆنە بۆرجوازییەکانەوە ناسیۆنی تازەی سۆسیالیستی هەڵدەقوڵێن و دەگوڕێن، زۆر زۆر یەکدگیرتر لە هەر ناسیۆنێکی بۆرجوازی تۆ بگری، چونکە ئەو ناسیۆنانە دوورن لە ناکۆکی سەختی چنایەتییەوە کەوا دەبێتە خۆرە بۆ گیانی ناسیۆنە بۆرجوازییەکان، چونکە دەسکەوتی گەل زیاتر دەگرێتەوە بەجۆرێک لەگەڵ هیچ ناسیۆنێکی بۆرجوازیدا ناپێورێ.

## سێیەم: پاشەڕۆژی ناسیۆنەکان و زمانە نیشتمانییەکان:

ئێوە هەڵەیەکی زۆر زل دەکەن کاتێک دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزم لە یەک وڵاتدا و دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزم لە سنوورێکی جیهانیدا وەک یەک دەدەنە قەڵەم، گوایە دەڵێن کە توانا و پێویستی هەیە بۆ نەهێشتنی جیاوازییە نیشتمانییەکان و زمانە نیشتمانییەکان و دۆزینەوەی تاکە

زمانێکی گشتی، نەک تەنها لە دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزم لە سنوورێکی جیهانیدا، بەڵکو هەروەها لە دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزم لە یەک وڵاتدا. ئێوە لێرەدا گەلێک شتی زۆر جیاواز لەگەڵ یەک تێکەڵ دەکەن واتا (نەهێشتنی زۆرداریی نیشتمانی) و (نەهێشتنی جیاوازییە نیشتمانییەکان) لەگەڵ یەک تێکەڵ دەکەن، هەروەها (نەهێشتنی سنووری نیشتمانی دەوڵەت) و (لەناوچوونی ناسیۆنەکان) و (چوونە ناو یەک)ی ناسیۆنەکان لەگەڵ یەک تێکەڵ دەکەن.

هەر دەبێ دەست ڕابکێشین بۆ ئەوەی کە هەرگز جایز نییە بۆ مارکسیستەکان کە ئەم مەفهوومە لەیەکنەچووانە تێکەڵ بکەن، چونکە لە لای ئێمە، لە وڵاتەکەماندا، زۆر دەمێکە زۆرداریی نیشتمانی لەناوبراوە، بەڵام ئەمە هیچ ئەوە نا گەیەنێ کە جیاوازییە نیشتمانییەکان لابراون و ناسیۆنەکان لە وڵاتەکەماندا لەناوچوون. لە لای ئێمە، لە وڵاتەکەماندا، دەمێکە مەرزی[1] نیشتمانی دەوڵەت لەناوبراوە و پاسەوانی سەرسنوور هەڵگیراوە و گومرگ لابراوە، لەگەڵ ئەوەشدا ئەمە هیچ ئەوە ناگەیەنێ کە ناسیۆنەکان چوونە ناو یەک و زمانە نیشتمانییەکان لەناوچوون و ئەم زمانانە گۆڕاونەوە بە تاکە یەک زمانی گشتی، هەر زمانێک بێ، بۆ هەموو ناسیۆنەکانمان.

---

١ مەرز: سنوور (ج. ن)

ئێوە هەردووکتان ڕازی نین لەو خوتبەیەم کە لە دانیشگای کۆمۆنیستی زەحمەتکێشانی ڕۆژهـەڵاتـدا دام (لـە ساڵی ١٩٢٥)دا و لەوێدا ئەو قسەیەم بەدرۆخستەوە کە دەڵێ: لە دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزمدا لە تاکە وڵاتێکدا و بۆ وێنە لە وڵاتەکەی خۆماندا، زمانە نیشتمانییەکان لە ناو دەچن (ئـاوا!) و ناسیۆنەکان دەتووێنەوە و تاکە زمانێکی گشتی دەردەکەوێ و شێوێنی زمانە نیشتمانییەکان دەگرێتەوە.

ئێوە پێتان وایە ئەم قسەیەی من پێچەوانەی ئەو باسە بەناوبانگەی لینینە کە دەڵـێ: ئامانجی سۆسیالیزم تەنها نەهێشتنی لەتلەتبوونی مرۆڤایەتی نییە بۆ چەند دەوڵەتێک و لەناوبردنی هەموو لە یـەک دوورییـەک نییە لە بەینی ناسیۆنەکان و تەنها نزیکبوونەوەی ناسیۆنەکان نییە، بەڵکو چوونەناویەکیشیانە.

بێجگە لەوەش پێتان وایە قسەکەم دووبارە پێچەوانەیە لـەگـەڵ باسـێکی تـری لـینـیـنـدا کـە دەڵـــێ: لـە دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزمدا لە سنوورێکی جیهانیدا جیاوازییە نیشتمانییەکان و زمانە نیشتمانییەکان دەست بە لەناوچوون دەکەن و لە پاش ئەم زاڵبوونە تاکە زمانێکی گشتی جێی ئەم زمانە نیشتمانییانە دەگرێتەوە.

ئەمەش، هاوڕێیینە بە جارێک ناڕاستە، ئەمە ڕێهەڵەکردنێکی تەواوە.

لەمەوە بەر لەسەرەوە وتم: جایز نییە بۆ مارکسیستەکان ڕووداوی لەیەکنەچوو تێکەڵ بکەن وەک (زاڵبوونی سۆسیالیزم لە تاکە وڵاتێکدا) و (زاڵبوونی سۆسیالیزم لە سنوورێکی جیهاندا) و بیانخەنە دوو تای تەرازوویەکەوە. چونکە نابێ لە بیرمان بچێ کە ئەم ڕووداوە لەیەکنەچووانە وێنەی پێچەوانەی دوو دەوری گەلێک لە یەک جیاوازن، نەک هەر تەنها لە ڕووی کاتەوە (ئەو شتەی کەوا یەکجار گرنگە) یەک لە یەکتری جیاوازن. بەڵکو بە ماهییەتیش لە یەک جیاوازن.

ئەو شتەی کەوا هەستی باوەڕنەبوونی نیشتمانی و جیاکردنەوەی نیشتمانی و قینەبەرایەتی نیشتمانی و بەیەکادانی نیشتمانی دەوروژێنێ و پشتی دەگرێ. بێگومان جۆرە هەستکردنێکی (زگماک) نییە بە کینەی نیشتمانی، بەڵکو هەوڵدانی ئیمپریالیزمە بۆ ملکەچکردنی ناسیۆنی تر و ترسی ئەم ناسیۆنانەیە لە خەتەری بەندەگەریی نیشتمانی. هیچ گومانی تیا نییە مادام ئیمپریالیزمی جیهانی هەیە، دیارە ئەو هەوڵە و ئەم ترسە هەر دەمێنن، لە ئەنجامدا باوڕ نەبوونی نیشتمانی و جیاکردنەوەی نیشتمانی و قینەبەرایەتی نیشتمایی و بەیەکدادانی نیشتمانی، هەروەها دەمێننەوە لە زۆربەی زۆری وڵاتەکاندا. جا ئایا دەتوانرێ بەدڵنیایی بوترێ کە زاڵبوونی سۆسیالیزم و نەمانی

ئیمپریالیزم لە تاکە وڵاتێکدا مانای نەمانی ئیمپریالیزم و زۆرداریی نیشتمانییە لە زۆر وڵاتاندا؟ ئاشکرایە ئەمە ناشێ. بەڵام لەمەوە دەردەهێنرێ کە زاڵبوونی سۆسیالیزم لە تاکە وڵاتێکدا ئەگەرچی بە شێوەیەکی کاریگەر ئیمپریالیزمی جیهانی بێهێز دەکا، بەڵام نە زرووفی پێویست دروست دەکا و نەدەشتوانێ دروستی بکا بۆ چوونەناویەکی ناسیۆنەکان و زمانە نیشتمانییەکانی دنیا لە تاکە یەکێکی گشتییدا دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزم لە سنوورێکی جیهانیدا جیایە لەگەڵ دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزم لە تاکە وڵاتێکدا، بەر لە هەموو شتێک، لەوەدا کە ئیمپریالیزم لە گشت وڵاتاندا ڕیشەکێش دەکرێ و ئارەزووی سەرشۆڕکردن بە ناسیۆنانی تر ناهێڵرێ و هەروەها مەترسی خەتەری بەندەگەری نیشتمانی لەناودەبرێ وەک یەک، دیسان باوڕنەبوونی نیشتمانی و قینەبەرایەتی نیشتمانی لە بنچینەوە هەڵدەکەندرێ و هەموو ناسیۆنەکان لە تاکە ڕژێمێکی ئابووریی سۆسیالیستی جیهانییدا یەک دەخرێن، بەوە زرووفی ڕاستەقینەی پێویست پەیدا دەبێ بۆ چوونەناویەکی هەموو ناسیۆنەکان بەرە بەرە لە تاکە یەکێکدا. ئەوە جیاوازی بنچنەیی بەینی ئەم دوو دەورە بوو.

بەڵام ئەو ئەنجامەی لەمە وەردەگیرێ ئەوەیە تێکەڵکردنی ئەم دوو دەورە جیاوازە و خستنیانە ناو دوو تای

تەرازوویەکەوە، مانای بەهەڵەچوونێکی گەورەیە، هەرگیز نابەخشرێ. با بگەڕێینەوە سەر وتارەکەم کە لە دانیشگای کۆمۆنیستی زەحمەتکێشانی ڕۆژهەڵاتدا داومە و لە بارەیەوە وتراوە: (لە بارەی پەیدابوونی تاکە زمانێکەوە قسە دەکەن ”بە وێنە کاوتسکی“[١] بۆ گشت مرۆڤایەتی و نەمانی هەموو زمانەکانی تر لە دەوری سۆسیالیزمدا). من زۆر کەم باوڕم بەم تیۆرییە هەیە، تیۆری تاکە زمانێک کە هەمووان بگرێتەوە. و تاقیکردنەوە بە هەموو بارێکدا، پشتی ئەم تیۆرییە ناگرێ، بەڵکو بە درۆی ئەخاتەوە. هەتا ئێستە ئیش و کار بە جۆرێک ڕۆیشتووە کە شۆڕشی سۆسیالیستی ژمارەی زمانەکانی کەم نەکردووەتەوە، بەڵکو زیادی کردوون، چونکە شۆڕش بە ورووژانـدن قوڵترین ڕیزی مرۆڤایەتی و پاڵپێوەنانی بۆ سەر شانۆی سیاسی، بۆ بەرەنگاربوونی ژیانی تازە، زنجیرەیەکی تەواو لەو نەتەوە تازانە ڕادەپەڕێنێ کەوا لەوە

---

١ کارڵ کاوتسکی ١٨٥٤ Karl Kautsky –١٩٣٨) یەکێکە لە دیارترین بیرمەند و تیۆری داڕێژەرە مارکسیستەکانی سەرەتای سەدەی بیستەم. بەهۆی شارەزایی زۆری لە نووسینەکانی کارڵ مارکس و فرێدریک ئەنگڵس، بە (پاپای مارکسیزم) دەناسراوە.  ناوبانگی کاوتسکی زیاتر بەهۆی ئەو مشتومڕە توندەیەوە بوو کە لەگەڵ ڤلادیمێر لینیندا هەیبوو. کاتێک کاوتسکی ڕەخنەی لە بەلشەفییەکان دەگرت و پێی وابوو سۆسیالیزم بەبێ دیموکراسی مەحاڵە و دیکتاتۆریەتی پرۆلیتاریا نابێت ببێتە دیکتاتۆریەتی پارتێکی سیاسی بەسەر گەلدا. لە ئەنجامدا لینین بە کتێبێکی (شۆڕشی پرۆلیتاری و کاوتسکی ناپاک) وەڵامی دایەوە.
(ڕێکخراوی ڕۆشنبیریی جەمال نەبەز)

پێش هەموو ناسیۆنی نەناسراو بوون، یان کەم ناسراو بوون. کێ بڕوای دەکرد کە لە ڕووسیای قەیسەری کۆندا، نزیکەی پەنجا ناسیۆن و نەتەوە بژی؟ بەڵام شۆڕشی ئۆکتۆبەر کۆت و زنجیری کۆنی پچڕاند و کۆمەڵێک لەم گەل و نەتەوە لەبیرنەماوانەی پاڵ پێوە نا بۆ سەر شانۆ و ژیانێکی تازە و گۆڕانێکی نوێی کردن بە بەردا.

لەم پرسە[1] وەرگیراوەوە دەردەکەوێ کە من بەرامبەر خەڵکی وەک کاوتسکی ڕاست بوومەتەوە، کە هەمشە و هەتا ئێستەش فڕی بەسەر مەسەلەی نیشتمانییەوە نییە و لە ڕژێمی گۆڕانی ناسیۆنەکان تێناگا و ئاگای لەو هێزە مەزنە نییە کە لە دەوامکردنی ناسیۆندا هەیە و توانای چوونەناویەکی ناسیۆنەکان بە شتێکی ڕاست دەزانێ هەتاوەکو لە پێش زاڵبوونی سۆسیالیزمدا بە ماوەیەکی درێژ، واتا لە دەوری ڕژێمی بۆرجوازە دیمۆکراتەکاندا و بە فیزێکەوە بە (کردەوەی) ئەڵمانەکاندا هەڵدەدا، کاتێک کە خەڵکی چکیا (بۆهیمیا)یان قووت دا، پاشان بە شێوەیەکی زۆر سەخیفانە پێی وایە کە چیکەکان بوونە جەرمەن و چیکەکان پاشەڕۆژیان نییە وەک (ناسیۆن).

بێجگە لەوەش لەم پرسە وەرگیراوەوە وا دەردەکەوێ کە من لە وتارەکەمدا مەبەستم لە دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزم

---

١ پرسە: جملة (ج. ن)

نەبووە لە سنووریکی جیهانیدا، بەڵکو مەبەستم لە دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزمە لە تاکە وڵاتێکدا و هیچی تر. لەم شوێنەدا دانم پیاناوە، (و ئێستەش دانی پیا دەنێمەوە) کە دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزم لە تاکە وڵاتێکدا، زورووفی پێویست ئامادە ناکات بۆ چوونەناویەکی ناسیۆنەکان و زمانە نیشتمانییەکانیان و ئەم دەورە، بەپێچەوانەوە، ناوچەیەکی مناسب ئامادە دەکات بۆ ژیانەوە و گەشەکردنی ئەو ناسیۆنانەی کەوا لە ڕابووردوودا چەوساوەی دەستی ئیمپریالیزمی قەیسەرییەوە و ئیمڕۆ شۆڕشی سۆڤیەتی ڕزگاری کردوون لە چنگ زۆرداریی نیشتمانی.

دوایی، لەم بەندە وەرگیراوەوە دەردەکەوێ کە ئێوە سەرنجی ئەو جیاوازییە گەورەیەتان نەداوە کە لە بەینی دوو دەوری مێژوویی جیاوازدا هەن و بەپێی ئەوە لە مەغزای وتارەکەی ستالین نەگەیشتوون و ئەنجامی ئەو هەمووەش ئەوەیە هەردووکتان لە ناو هەڵە تایبەتییەکانی خۆتاندا ڕێگەتان ون کردووە.

با بێینە سەر باسەکانی لینین لە بارەی لەناوچوون و چوونە ناویەکی ناسیۆنەکانەوە پاش زاڵبوونی سۆسیالیزم لە سنووریکی جیهانیدا، ئا ئەوەش یەکێکە لە باسەکانی لینین کە لە وتارێکی لینینەوە وەرگیراوە بە ناوی (شۆڕشی سۆسیالیزم و هەقی ناسیۆنەکان لە بڕیاری چارەنووسدا).

کەوا لەساڵی ١٩١٦دا بڵاوکرایەوە و نازانرێ سەبارەت بە چی لە نامەکانتاندا بە شێوەیەکی تەواو وەرتان نەگرتووە:

(ئامانجی سۆسیالیزم هەر تەنها نەهێشتنی لەتلەتبوونی مرۆڤایەتی نییە بۆ چەند دەوڵەتێک و لەناوبردنی هەموو لە یەک دوورییەک نییە لە بەینی ناسیۆنەکاندا و لەیەکنزیککردنەوەی ناسیۆنەکان نییە، بەڵکو چوونە ناو یەکیشیانە... و وەک چۆن مرۆڤایەتی ناتوانێ بچێتە دەوری لەناوبردنی چینەکانەوە جگە پاش ماوەیەکی ئینتیقالی نەبێ کە دیکتاتۆریەتی زۆرلێکراو ئەیبڕێ، ئاواش مرۆڤایەتی ناتوانێ بگاتە چوونەناویەکی ناسیۆنەکان، ئەو چوونەناویەکەی کەوا بوونی بۆ نییە جگە پاش ماوەیەکی ئینتقالی نەبێ لە ڕزگاربوونی تەواو هەموو ناسیۆنە زۆرلێکراوەکان واتا سەربەستی جیابوونەوەیان). (تەماشای ک: ١، ل: ٤٠ بکە).

ئا ئەمەش باسێکی تری لینینە کە ئەویشتان بەتەواو وەرنەگرتووە. مادام جیاوازییە نیشتمانییەکان و ئەو جیاوازییانەی کەوا ناسیۆنەکان لە یەکتر هەڵاوێرێ لە بەینی گەلان و وڵاتاندا هەیە و ئەم جیاوازییانە دەمێنن هەتاوەکو هاتنەدی دیکتاتۆریەتی پرۆلیتاریا لە سنوورێکی جیهانیدا بۆ ماوەیەکی درێژ و زۆر درێژ، دیارە ئەوەی کە یەکێتیی تەکنیکی ئینتەرناسیۆنالیست گەرەکێتی بۆ بزووتنەوەی کۆمۆنیستانەی کرێکاران لە گشت وڵاتاندا نەهێشتنی هەمە

ڕەنگە جیاوازییە نیشتمانییەکان و لەناوبردنیان نییە (کە ئـەوەش لەباری ئێستەماندا وەک زیندەخەو وایـە). بەڵکو تەتبیقی سـەرەتا بنچینەییەکانی کۆمۆنیزمە (واتا دەسـەڵاتی سۆڤیەتی و دیکتاتۆریەتی پرۆلیتاریا) بە شێوەیەک کە بتوانرێ، لە زرووفێکی دیاریکراوا، ئەم سەرەتایانە بەجۆرێکی ڕاسـت بگۆڕرێن و وایـان لێ بکرێ کە لەگەڵ جیاوازییە نیشتمانییەکان و جیاوازییە نیشتمانییەکانی دەوڵەتێکی خۆی بگونجێ، پاشان تەتبق بکرێ). (تەماشای ک: ۲۵، ل: ۲۲۷ بکە).

پێویستە دەسـت ڕابکێشین بۆ ئـەوەی کە ئەم بەندە لە نامیلکەکەی لینینەوە وەرگـیـراوە کـە نـاوی (نەخۆشیی چەپڕەویی منداڵانەیە لە کۆمۆنیزمدا). کە لە ساڵی ۱۹۲۰دا بڵاوکراوەتەوە، واتا پاش زاڵبوونی شۆڕشی سۆسیالیزمی لە تاکە وڵاتێکدا و پاش زاڵبوونی سۆسیالیزم لە وڵاتەکەماندا.

لـەم بەندە وەرگـیـراوانـەوە دەردەکـەوێ کە لینین ڕێی لەناوچوونی جیاوازییە نیشتمانییەکان و چوونەناویەکی ناسیۆنەکان نابەستێ بە دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزمەوە لە تاکە یەک وڵاتدا، بەڵکو تەنها ئەیبەستێ بە دەوری پاش هاتنەدی دیکتاتۆریەتی پرۆلیتارییەوە لە سنوورێکی جیهانیدا و اتە ئەیبەستێ بە دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزمەوە لە گشت وڵاتاندا، کاتێ کە بنچنەکانی ئابووری و سۆسیالستی جیهانی دادەنرێ.

هەروەها لەم بەندە وەرگراوانەوە دەردەکەوێ کە لینین هەوڵدانی ئەوانەی کە جیانەوێ ڕێگەی لەناوچوونی جیاوازییە نیشتمانییەکان ببەستن بە دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزمەوە لە تاکە وڵاتێکدا واتا لە وڵاتەکەماندا، بە زیندە خەو دەداتە قەڵەم.

بێجگە لەوەش، لەم بەندە وەرگراوانەوە وا دەردەکەوێ کە ستالین بە تەواوی لەسەر هەق بووە کاتێک لە وتارەکەیدا کە لە دانیشگای کۆمۆنیزمی زەحمەتکێشانی ڕۆژهـەڵات داویە و توانای لەناوچوونی جیاوازییە نیشتمانییەکان و زمانە نیشتمانییەکانی بە ڕاست نەزانیوە لە دەوری زاڵبوونی سۆسیالیزمدا لە تاکە وڵاتێکدا واتا لە وڵاتە کەماندا. بەڵام ئێوە بە جارێ لەسەر ناهەق بوون کە لایەنگری شتێکتان کردووە کە لەگەڵ باسەکەی ستالیندا دوو بەرەی ناکۆکن.

دوایـی لـەم وەرگـیـراوانـەوە دەردەکـــەوێ کـە ئێوە بە تێکەڵکردنی دوو دەوری جیاواز بۆ زاڵبوونی سۆسیالیزم، لە لینین نەگەشتن و پێڕەوی لینینتان گێڕ کردووە لە بارەی مەسەلەی نیشتمانییەوە، ئەنجامی ئەمەش ئەوەیە کە بێ ئـەوەی دەسـەڵاتـتـان بەسەر خۆتاندا ببێ، بە ڕێگەیەکدا کەوتوونەتەڕێ کە هیچ مافی بە لینینیزمەوە نییە.

شتێکی ڕاست نییە کەوا بزانرێ نەهێشتنی جیاوازییە نیشتمانییەکان و لـەنـاوچـوونـی زمـانـە نیشتمانییەکان

ڕاستەوخۆ پێکدێن پاش ڕووخانی ئیمپریالیزمی جیهانی و بە چاوتروکاندنێک و لە ڕێگەی ئەو شتەوە کە دەتوانرێ پێی بوترێ دەرکردنی مەراسم لەسەرەوە.

هیچ شتێک نییە لەم بەڵایە قورستر بێ. چونکە هەوڵدان بۆ تواندنەوەی ناسیۆن لە ڕێگەی دەرکردنی مەراسیمەوە لەسەرەوە و لە ڕێگەی زۆرلێکردنەوە مانای وایە پیاو دەبێ بە بووکەشووشەیەک بەدەست ئیمپریالیزمەوە و مانای سەرنەگرتنی مەسەلەی ڕزگاربوونی ناسیۆنەکانە و زندەبەچاڵکردنی مەسەلەی ڕێکخستنی هەرەوەز و برایەتی بەینی ناسیۆنەکانە، ئەم چەشنە سیاسەتانە، هاوتای سیاسەتی تواندنەوەی ناسیۆنەکانە. بێگومان هەردووکتان دەزانن کە سیاسەتی تواندنەوە بەجارێک کۆنکرێتیی مارکسیزمی لینینیزم ئێپی دەکاتەوە. چونکە سیاسەتێکی دوژمنانەیە لەگەڵ گەل و خوێنەخوێی شۆڕشە، بەو پێیەی کە سیاسەتێکی کوشندەیە. بێجگە لەوەش، شتێکی ئاشکرایە، کە ناسیۆنەکان و زمانە نیشتمانییەکانیان هەڵداوێرێن بەخۆڕاگرتنی بە ئەندازە و هێزی مەزنیان لە بەرەنگارکردنی سیاسەتی توانەوەدا. تورکەکان شەیدای سیاسەتی تواندنەوەن و پیسترینی ئەوانەن کە ئەم سیاسەتەیان بەکارهێناوە، ئەوە بوو ناسیۆنە. بەڵقانییەکانیان ئازاردا و لە پەلوپۆیان خستن، بەڵام لە وزەیاندا نەبوو قڕیان کەن،

نەک هەر تەنها ئەوەش بەڵکو ناچار بوون بە ملکەچکردنی ڕووسپەرستەکان لە ڕووسیای قەیسەریدا و جەرمەنپەرستە برووسییە ئەڵەمانەکان، کەوا چەپیان نەبوو لە تورکە میللەت تووێنەرەوەکان، هەڵیان کوتایە سەر ناسیۆنی پۆڵۆنی و لە سەد ساڵ زیاتر ئەشکەنجەیان دان، هەروەها ئێرانی و تورکە میللەت توێنەرەوەکان، ماوەی سەدان ساڵ هەڵیان کوتایە سەر گەلی ئەرمەنی و جۆرجی و ئازاریان دان و هەوڵیان دا بۆ قڕکردنیان، لەگەڵ ئەوەشدا نەیانتوانی ئەم گەلانە لەناوبەرن، نەک هەر تەنها ئـەوەش، بەڵکو بەپێچەوانەوە ناچار بوون بە ملکەچکردن.

پێوستە هەموو ئەم شتانە لەبەرچاوبگرین هەتاوەکو بە شێوەیەکی ڕاستەقینە ڕێگەی ڕووداوە چاوەڕوانکراوەکان لێک بدەینەوە لە باری سەرنجی گۆڕانی ناسیۆنەوە، ڕاستەوخۆ پاش ڕووخانی ئیمپریالیزمی جیهانی.

هەڵەیە وابزانن کە یەکەمین پلەی دەوری دیکتاتۆرێتی جیهانیی پرۆلیتاریا دەبێتە سەرەتای لەناوچوونی ناسیۆنەکان و زمانە نیشتمانییەکان، سەرەتای دروستکردنی تاکە زمانێکی گشتی. بەپێچەوانەوە، یەکەمین پلە کە بەجارێک زۆرداریی نیشتمانی تیا لەناو ئەبرێ، دەبێتە پلەی نەشونمای ناسیۆنە چەوساوەکانی پێشوو و زمانە نیشتمانییەکانیان و گەشەکردنیان و دەبێتە پلەی چونیەک لە بەینی ناسیۆنەکاندا و

پلەی ڕیشەکێشکردنی کەمباوەڕی بەینی ناسیۆنەکان و پلەی دامەزراندن و پتەوکردنی پەیوەندییە ئینتەرناسیۆنالیستەکان لە بەینی ناسیۆنەکاندا.

تەنها لە پلەی دووەمی دەوری دیکتاتۆریەتی جیهانیی پرۆلیتاردا و بە قەد ئەوەندەی کە تاکە ئابوورییەکی سۆسیالیستی جیهانیی پەیدا دەبێ، جێی ئابووریی سەرمایەداری جیهانیی دەگرێتەوە، تەنها لەم پلەیەدا شتێک دەردەکەوێ لە زمانی گشتی دەچێ، چونکە تەنها لەم پلەیەدا ناسیۆنەکان هەست بە پێویستی بوون تاکە زمانێکی ئینتەرناسیۆنالستی موشتەرەک دەکەن لەپاڵ زمانی نیشتمانی خۆیاندا، بۆ ئاسان کردنی ئامشۆکردن و ڕاییکردنی هەرەوەزی ئابووریی خوێندەواری و سیاسی. بەم جۆرە لەم پلەیەدا زمانێکی ئینتەرناسیۆنالیستیی گشتی دەبێ شانبەشانی زمانە نیشتمانییەکان. دەشێ کە لەسەرەتادا تاکە ناوچەیەکی ئابووریی جیهانیی گشتی دانەمەزرێ بۆ هەموو ناسیۆنەکان لەگەڵ زمانێکی گشتی، بەڵکو چەند ناوچەیەکی ئابووریی کیشوەری دابمەزرێ بۆ چەند تیرەیەکی ناسیۆنی سەربەخۆ، لەگەڵ زمانێکی سەربەخۆ بۆ هەر تیرەیەک لەو ناسیۆنانە، تەنها لە ئەنجام ئەوەدا ئەم ناوچانە یەکدەگرن لە تاکە ناوچەیەکی گشتی جیهانیدا بۆ ئابووریی سۆسیالیستی لەگەڵ تاکە زمانێکی گشتی بۆ هەموو ناسیۆنەکان.

لە پلەی دووەمی دەوری دیکتاتۆریەتی جیهانی پرۆلیتاردا، کاتێ کە ڕژێمی ئابووریی سۆسیالیستی جیهانیی بنبەست دەبێ بە ڕادەیەکی کافی و سۆسیالیزم دەچێتە گیانی گەلانەوە و کاتێک گەلان بە شێوەیەکی پراکتکی ئیقناع دەبن بە چاکەی زمانە گشتییەکە لەچاو زمانە نیشتمانییەکان ئەو دەمە جیاوازیی نیشتمانی و زمانەکان دەست بە نەمان دەکەن و زمانێکی جیهانیی گشتی بۆ هەمووان جێگەی ئەوانە دەگرێ. ئەوە بە بیروباوەڕی من وێنەیەکی تەقریبی بوو بۆ پاشەڕۆژی ناسیۆنەکان وێنەی گۆڕانی ناسیۆنەکان لە ڕێگەی چوونەناویەکیانەوە لە پاشەڕۆژا.

**چوارەم: سیاسەتی پارتی[1] لە مەسەلەی نیشتمانییدا:**

یەکێک لە هەڵەکانتان ئەوەیە ک ئێوە وا دەڕوانننە مەسەلەی نیشتمانی نەک وەک بەشێک لە مەسەلەی گشتی لەبارەی گۆڕانی کۆمەڵایەتی و سیاسی کۆمەڵێکەوە، کە هەر بەم مەسەلە گشتییەوە بەستراوە، بەڵکو وەک شتێکی سەربەخۆی بەردەوام کە بە درێژایی مێژوو نە لە ڕەوشتیدا دەگۆڕێ و نە لە سروشتیدا دەگۆڕێ گۆڕانێکی بنچینەیی. لەبەرئەوە ئەوەی کە مارکسیستێک دەیبینێ ئێوە نایبینن واتا نازانن کە مەسەلەی نیشتمانی هەتاسەر سروشتێکی تەنهای

١ مەبەستی لە پارتی کۆمۆنیستی یەکێتیی سۆڤیەتە. (ج. ن)

نییە، بەڵکو سروشتی بزووتنەوەی نیشتمانی ئەگۆڕێ و پێسپێراوییەکانی وەک خۆی نامێنێ بە پێی جیاوازی پلەکانی گۆڕانی شۆڕش.

ئەوەی بە شێوەیەکی مەنتقییانە ئەوە لێک ئەداتەوە ئەو واقیعە پڕ لە داخەیە واقیعی ئەوەی کە ئێوە بەم ئاسانییە چەند دەورێکی لەیەک نەچوو لە دەورەکانی گۆڕانی شۆڕش تێکەڵ یەک دەکەن و ئەیانخەنە بەرامبەر یەک، هەست پێناکەن کە گۆڕانی سروشتی و پێسپێراوی شۆڕش لە پلە جیاوازەکانی گۆڕاندا دەبێتە هۆی چەند گۆڕانێکی پێوست لە سروشت و پێسپێراو مەسەلەی نیشتمانی و پێبەپێی ئەوە سیاسەتی پارتش دەگۆڕێ لە مەسەلەی نیشتمانییدا و لە ئەنجامدا سیاسەتی پارت لە مەسەلەی نیشتمانییدا، ئەو سیاسەتەی کە بەستراوە بە تاکە دەورێک لە دەورەکانی گۆڕانی شۆڕشەوە، ناتوانرێ بە تۆپزی لەم دەورە جیا بکرێتەوە و هەر بە زۆر بگوێزرێتەوە بۆ دەورێکی تر.

مارکسیستە ڕووسەکان بەوچان ئەگەڕانەوە سەر ئەم سەرەتایە، سەرەتای ئەوەی کە مەسەلەی نیشتمانی بەشێکە لە مەسەلەی گشتی لەبارەی گۆڕانی شۆڕشەوە و مەسەلەی نیشتمانی لە هەموو جۆرە پلەکانی شۆڕشدا پێسپێراوی جیاجیای خۆی هەیە لەگەڵ سروشتی شۆڕشدا ڕێکدەکەوێ لە هەموو دەمێکی مێژوویی ناسراودا و پێبەپێی

ئەوە سیاسەتی پارتیش دەگۆڕێ لە مەسەلەی نیشتمانییدا.

لە دەوری پێش شەڕی یەکەمی جیهانی، کاتێک کە مێژوو لە ڕووسیادا پاڵی بە شۆڕشی بۆرجوازی دیمۆکراتییەوە نا، بۆ سەر شانۆ بەوپێیەی کە پێسپێراوی ئەو دەمەیە، مارکسیستە ڕووسەکان چارکردنی مەسەلەی نیشتمانییان بەست بە چارەنووسی ئینقلابی دیمۆکراتیەوە لە ڕووسیادا. پارتەکەمان ڕووخانی قەیسەرێتی و ڕیشەکێشکردنی پاشماوەی دەرەبەگی و بڵاو کردنەوەی دیمۆکراسی لە وڵاتەکەدا بە شێوەیەکی تەواو، بە باشترین چار دایە قەڵەم بۆ مەسەلەی نیشتمانی، کە بتوانرێ بکرێ لە سای سێبەری سەرمایداریدا.

ئەوە بوو سیاسەتی پارتی لەم دەورەدا.

وتارە بەناوبانگەکانی لینین لەبارەی مەسەلەی نیشتمانییەوە دەگەڕێتەوە بۆ ئەم دەورە، لەو وتارانە (چەند سەرنجێکی ڕەخنەگرانە لەبارەی مەسەلەی نیشتمانییەوە). لینین ئەمەی خـوارەوەی تیا دەڵـێ: (مـن بە دڵنیاییەوە دەڵێم کە تەنها تاکە چارەکردنێک هەیە بۆ مەسەلەی نیشتمانی، مادەم بە وێنەیەکی گشتی، توانای ئەوە هەیە لە دنیای سەرمایەداریدا و ئەم چارکردنەش بڵاوکردنەوەی دیمۆکراسی بنج داکوتراوە. و بۆ ئیسپاتکردنی ئەوە سویسرا دەهێنمە پێشەوە بە وێنە). (تەماشای ک: ١٧، ل: ١٥٠، بکە).

نامیلکەکەی ستالینیش کە ناوی (مارکسیزم و مەسەلەی نیشتمانی)یە هەر دەگەڕێتەوە بۆ ئەم دەورە لەوێدا تیایەتی کە:

(دوای ڕووخانی بزووتنەوەی نیشتمانی نایەتەدی جگە لەگەڵ ڕووخانی بۆرجوازیەتی نەبێ. هەروەها ئاسایش بەتەواوی بنبەست نابێ جگە لە دنیای سۆسیالیزمدا نەبێ. بەڵام دەشێ لە سای سێبەری سەرمایەداریدا تێکۆشانی نیشتمانی ڕاپێچ بکرێ بۆ سنووری هەرە کەمی و لە بنچینەوە هەڵبکەندرێ و ای لێ بکرێ هەرە کەمترین زیان بگەیەنێ بە پرۆلیتاریا. بام سویسرا و ئەمەریکا بکەین بە نموونەی ئەم وێنەیە. و ئەوەش دەبێ دیمۆکراسی لە وڵاتەکەدا بڵاوبکرێتەوە و توانایەکی ئەوتۆ بدرێ بە ناسیۆنەکان کە بە سەربەستی بگۆڕێن).

لە پلەی دووەمیشدا واتا لە دەوری شەڕی جیهانیی یەکەمدا کاتێ جەنگی دوور و درێژی بەینی هەردوو بەرە ڕێککەوتووەکەی ئیمپریالستەکان وزەی لە ئیمپریالیزمی جیهانیی بڕی و کاتێک تەنگوچەڵەمەی ڕژێمی سەرمایەداری گەیشتە پۆپە و کاتێک وڵاتە داگیرکراوەکان و بەگەڵکەوتووەکان هەستانە سەر پیان بۆ بزووتنەوەی ڕزگاریخوازانە لە تەنیشت چینی کرێکارەوە لە (وڵاتە خاوەن موستەعمەرەکاندا) و کاتێک مەسەلەی نیشتمانی گەشەی کرد و بوو بە مەسەلەیەکی نیشتمانی و مەسەلای

موستەعمەرات و کاتێک بەرەی یەکگرتووی چنی کرێکار لە وڵاتە سەمایەدارە پێشکەوتووەکان و گەلە چەوساوەکانی وڵاتـە موسـتـەعـمـەرەکان وڵاتـە ئیستیعمارکراوەکان و بەگەڵکەوتووەکان دەستیکرد بەوەی ببێتە هێزێکی ڕاستەقینە و لە ئەنجامدا، کاتێک مەسەلەی شۆڕشی سۆسیالیستی بوو بە مەسەلەیەکی دەمودەست، ئەو کاتە لە توانای مارکسیستە ڕووسەکاندا نەما، کە بە سیاسەتی دەوری پێشوو ڕازی بن و بە پێویستیان زانی کە چارکردنی مەسەلەی نیشتمانی و مەسەلەی موستەعمەرەکان ببەستن بە چارەنووسی ئینقیلابی سۆسیالیستەوە.

پارتی پێی وابوو کە چاکترین چارەکردن بۆ مەسەلەی نیشتمانی و مەسەلەی موستەعمەرەکان، لە زرووفی ئەو کـاتـەدا، ڕووخـانـی دەسـەڵاتـی سەرمایە و جێگیرکردنی دیکـتـاتـۆریـەتـی پـرۆلـیـتـاریـا و دەرکـردنـی لەشکرەکانی ئیمپریالیستە لـە سـنـووری وڵاتـە مـوسـتـەعـمـەرەکـان و بەگەڵکەوتووەکانە و دان پیانانە بە هەقی جیابوونەوەی ئەم وڵاتانەدا و دەمەزراندنی دەوڵەتی نیشتمانییە بۆیان و ڕیشەکێشکردنی دوژمنایەتیی نیشتمانی و نەغمەی ڕەگەزپەرست و بەهێزکردنی پەیوەندی ئینتەرناسیۆنالیستە لە بەینی گەلاندا و ڕێکخستنی ئابوورییەکی نیشتمانیی یەکگرتووی موشتەرەکە و دامەزراندنی هەرەوەزییەکی

برایانەیە لە بەینی گەلاندا لەسەر ئەم بنچنەیە. ئەوە بوو سیاسەتی پارت لەم دەورەدا.

ئەم دەورەش هێشتا هەر دوور بوو لە ماوەکەیەوە، چونکە ئەو دەمە دەستی پێکرد بوو، بەڵام هیچ گومانی تیا نەبوو کەوا لەوەلا گۆی هونەر دەباتەوە.

مەسەلەی دەوری ئێستەی گۆڕانی شۆرش لە وڵاتەکەماندا لەگەڵ سیاسەتی ئەمڕۆی پارت ئەهمیەتێکی تایبەتی پێدەدرێ.

دەبێ دەستێک ڕابکێشرێ بۆ ئەوەی کە وڵاتەکەمان ئێستە دەریخستووە کە تاکە وڵاتێکی ئامادەیە بۆ ڕووخانی سەرمایەداری و هەر بە ڕاستیش سەرمایەداریی ڕووخاندووە و دیکتاتۆریەتی پرۆلیتاریای جێگر کردووە و لە ئەنجامدا کەلێنەکە هێشتا گەورەیە هەر لەوەی دیکتاتۆریەتی پرۆلیتاریدا لە سنوورێکی جیهانیدا بێتە دی، بە واتەیەکی تر، بەرلەوەی سۆسیالیزم لە گشت وڵاتاندا زاڵ ببێ.

هەروەها دەبێ دەست ڕابکێشن بۆ ئەوەی کە ئێمە، بە لەناوبردنی دەسەڵاتی بۆرجوازی کە لە دەمێکەوە لە هەڵسوکەوتی کۆنی دیمۆکراتیانەی خۆی چووەتە دەرەوە، پێسپێراوی (بڵاوکردنەوەی دیمۆکراسی تەواو لە وڵاتەکەماندا) چار کرد و ڕژێمی زۆرداریی نیشتمانیمان لەناوبرد و چونیەکی بەینی ناسیۆنەکانمان هێنایەدی لە وڵاتەکەماندا.

وەک دەرکەوتووە دیارە ئەم چارکردنانە چاکترین هۆن بۆ ڕیشەکێشکردنی نەغمەی ڕەگەزپەرستی و قینەبەرایەتیی نیشتمانی و جێگیرکردنی باوەڕ لە بەینی گەلاندا.

دوایی دەبێ دەستێک ڕابکێشین بۆ ئەوەی کە لە ناوبردنی زۆرداریـی نیشتمانی بوو بە هۆی ژیانـەوەی نیشتمانی ئەو ناسیۆنانەی کـەوا لە ڕابــوردوودا زۆرلێکراو بوون لـە وڵاتـەکـەمـاندا و بـوو بـەهـۆی بەهێزکردنی پەیوەندی هاوڕێیەتی ئینتەرناسیۆنالستی لە بەینی گەلانی وڵاتە کەماندا و ڕێکخستنی هەرەوەزی لە بەینیاندا لە باری دامەزراندنی سۆسیالیزمەوە.

پێویستـە باسێکی ئــەوە بکـەین کـە ئـەم ناسیۆنـە ڕاستـەوەبووانـە وەک ئـەو ناسیۆنە بۆرجوازییە کۆنانە نەماونەتەوە کە بۆرجوازیەتی پێشڕەوی دەکـردن، بەڵکو هەموو ناسیۆنی سۆسیالیستی تازەن لەسەر داروپەردووی ناسیۆنە کۆنەکانەوە هەڵقوڵیون و پارتی کۆمەڵانی خەڵقی ئینتەرناسیۆنالیستی زەحمەتکێش پێڕەوییان دەکا.

سەبارەت بەوە پارتی وای بە پێویست زانی کە دەستی یارمەیەتی درێژ بکا بۆ ئەو ناسیۆنانەی کە لە وڵاتەکەماندا ژیاونەتەوە تا بە هەموو هێزێکیانەوە بکەونە سەرپێ و کولتووریی نیشتمانییان بکەوێتە ڕوو و بگۆڕێ، لەبەر

ئەوە، قوتابخانە و شانۆ و گەلێ ناوچەی کولتووریی تر زۆر دەکا بۆ ئەوەی زمانی زگماکی تیا بڵاوببێتەوە، پاشان دەزگا پارتییەکان و نەقابییەکان و هەرەوەزییەکان و دەزگا دەوڵەتییەکان و ئۆرگانە ئابوورییەکان دەکا بە هی گەل بەوەی ئەندامەکان لە ڕۆڵەی ئەو ناسیۆنە دادەنێ، پاشان هەموو میللەتە نیشتمانییەکان و پارتییەکان و سۆڤیەتییەکان دەخاتە ژێر دەستی خۆیەوە و لغاو دەخاتە دەمی ئەوانەوە کە سەرەڕای کەمیی ژمارەیان، هەوڵ دەدەن، بۆ تەگەرە دانان بۆ ئەم سیاسەتەی پارتی.

ئەمەش مانای وایە کە پارتی ئێستە و لەمەودواش پشتگری گۆڕان و گەشەکردنی کولتووری نیشتمانی گەلانی وڵاتەکەمان دەکا و مەسەلەی جێگربوونی ناسیۆنە سۆسیالیستە تازەکانمان هانئەدا و بەرگریکردن بۆ ئەم مەسەلەیە و پاراستنی لە هەموو چەشنە دوژمنێکی (لینین) دەخاتە ئەستۆی خۆی.

لە نامەکانتاندا وا دەردەکەوێ کە بەم سیاسەتەی پارتەکەمان ڕازی نابن، یەکەمین هۆی ئەوەش ئەوەیە ئێوە ناسیۆنە سۆسیالیستە تازەکان لەگەڵ ناسیۆنە بۆرجوازییە کۆنەکان تێکەڵ دەکەن و تێنەگەیشتن کە کولتوورە نیشتمانییەکانی ناسیۆنە سۆڤیەتییە تازەکان بە خۆیان و

ناوەڕۆکیانەوە کولتووری سۆسیالیستین. و دووەمن، هۆی ئەوەش، ئەوەیە ئێوە لە مەسەلەکانی لینینیزمدا بە توندییەوە سمکۆڵ دەکەن، بمبەخشن لە بەکارهێنانی ئەم واتە ناشرینەدا و بە شێوەیەکی زۆر خراپ لە مەسەلەی نیشتمانی حاڵی بوون.

ئێوە سەرنجێک بدەن بام بۆ ئەم مەسەلە سوکەڵەیەی خوارەوە بێ؛ هەموومان باس لە پێویستی شۆڕشی کولتووریی دەکەین لە وڵاتەکەماندا، جا ئەگەر لە مەوقیفێکی توندوتۆڵدا وەستاین بەرامبەر بەم مەسەلەیە و نەختێک زمانی خۆمان لە چەنەبازی گرتەوە، ئەو کاتە دەبێ یەکەمین هەنگاو بنێین لەم ڕێگەیەدا واتا بەر لە هەموو شتێک دەبێ خوێندەواری سەرەتایی بە زۆر بسەپێنین بەسەر هەموو هاونیشتمانەکانی وڵاتەکەماندا بێ ئەوەی جیاوازی نەتەوایەتی تیابێ، پاشان خوێندەواری ناوەندی. ئاشکرایە بەبێ ئەوە هیچ گۆڕانێکی کولتووریی لە وڵاتەکەماندا ڕوو نادا. ئیتر واز لە قسەکردن ئەهێنم لە بارەی شۆڕشی کولتوورییەوە. پاشان بەبێ ئەوە هیچ ڕاپەڕنێکی ڕاستەقینەی پیشەسازی و کشتوکاڵیمان لا دەرناکەوێ، هەروەها وڵاتەکەشمان بەرگرییەکی ئەوتۆی نابێ پشتی پێ ببەسترێ.

بەڵام چۆن دەتوانرێ ئەوە پێکبهێنرێ ئەگەر هاتوو

نیسبەتی سەدانەی نەخوێندەوارەکانی وڵاتەکەمان خرایە بەرچاو کە هێشتا هەر زۆر گەورەیە و لە هەندێک لە ناسیۆنەکانی وڵاتەکەماندا دەگاتە ٨٠–٩٠ لە سەدا.

لەبەر ئەوە دەبێ وڵاتەکە بە تۆڕێکی چڕ دابپۆشین لە قوتابخانە و هەر بە زمانی ئەو شووێنانە و مامۆستای وای بۆ ئامادە بکەین کە شارەزای زمانی ئەو شوێنانە بن.

لەبەر ئەوە پێویستە هەموو جیهازە ئیدارییەکان بکرێن بە هی گەل، هەر لە پارتی و نەقابییەوە هەتا دەگاتە جیهازەکانی دەوڵەت و دەزگا ئابوورییەکان، بەوەی کە هەموو ئەندامەکان لە ڕۆڵەی ئەو ناسیۆنە دابنرێن.

بۆ ئەوەش دەبێ ڕۆژنامە و شانۆ و سینەما و دەزگای کولتووریی تر بڵاو بکرێتەوە بە زمانی دایک و باوک.

ئەگەر دەپرسن: بۆچی بە زمانی دایک و باوک؟ چونکە بە ملیۆن لە کۆمەڵانی گەل دەتوانن سەرکەوتنێکی زۆر بهێننە دەست لە ڕووی گۆڕانی کولتووری و سیاسی و ئابووریدا تەنها بە زمانی باوک و دایک واتا بە زمانی نیشتمانی.

پاش هەموو ئەوانەی وتران، پێم وایە کە هەستکردن بەم باسە بە گران نەماوەتەوە، ئەویش ئەوەیە لینینیستەکان، دیارە ئەگەر ویستیان بە لینینیستی بمێننەوە، نابێ لە مەسەلەی نیشتمانییدا ڕێی سیاسەتێکی تر بگرن، جگە ئەو

سیاسەتە نەبێ کە ئێستە لە وڵاتەکەماندا پێڕەوی دەکرێ. ئەی وا نییە؟

کەواتە با کۆتایی بە باسەکە بهێنین، من لام وایە وەرامی هەموو پرسیارەکان و خەیاڵەکانتانم دایەوە.

**١٨ مارت ١٩٢٩**

**ئیتر سڵاوی کۆمۆنیستانەم پێشکەش دەکەم**

**ی. ستالین**



جەمال نەبەز
(١٩٣٣ - ٢٠١٨)
١٩٥٦/٨/٢٠ - دیمەشق

# Jiyannamey Cemal Nebez

Amadekirdin: Kenar Osman
Berlîn 19\1\2019

Cemaledîn Tofîq Mehmûd Xidir Axa Dizeyî, nasraw be (Cemal Nebez), le bawk û daykêkî Kurd, berebeyanî rojî heynî rîkewtî 1\12\1933 le şarî Silêmanî le gerekî Goyje ledaykbuwe û mamosٔta şêx Mihemedî Xal, nêwî nawe (Cemaledîn) wek xoy le bîrewerîynamekeyda (Bîrewerîynamey ew rojaney carekî dîy nagerênewe - 2017) rûnî dekatewe, le bneretda le hozekanî Dizeyyatî Hewlêrewe hatûnete şarî Silêmanî û lewê cêgîr bûn. Cemal nebez, xawenî pênc xuşk û brayek buwe, benêwekanî (Heybet, Nafî‘e, Kafê, Zekê, Kemaledîn û Nî‘met)

Cemal Nebez, zanisٔtkar, mêjûnûs, Kurdnas, rojhelatnas, rojnamewan, zimanzan, yasanas, nûser û wergêr buwe.

**Xwêndinî Cemal Nebez:**

- Salî 1939 ta salî 1950 xwêndinî seretayî û nawendî û dwanawendî le Silêmanî tewawkirduwe.

- Le mangî 10 î salî 1950 deçête Bexda û lewê le zankoy Bexda, kolêjî perwerde, le beşî zansitî fîzîk û matmatîk dexwênêt û le salî 1954 xwêndinekey tewaw dekat. Le mawey xwêndinekeyda, çend kesêtîyekî başî ew serdeme denasêt, dukanekey rewanşad usٔtad (Beşîr Muşîr) melbendî

kobûnewey roşnibîranî ewkate buwe û her lewê legel nûseran û roşnbîranî Kurdî ew katey Bexda debête hawrê.

- Le hawînî salî 1956 deçête şam û çawî be çendîn nûserî Kurd û kesêtîyekanî ewsay ewê dekewêt û peywendî legelyanda debes̃têt, lewane Osman Sebrî û Reşîd Kurd û malbatî Bedirxanîyekan.

- Le hawînî salî 1957 deçête rojhelatî Kurdis̃tan û çawî be roşinbîrekanî ewê dekewêt lewane Mihemed Merdoxî Kurdis̃tanî û Elî Heyderî nasraw be (Fatîh).

- Salî 1962 be mebes̃tî xwêndinî bwarekanî perwerde û Êrannasî û Îslamnasî rû le Ewrupa dekat û sereta le şarî Jinêvî Swêsra, des̃t be xwêndinekey dekat.

- Le nêwan salanî 1963 ta 1966 da zankokanî Munîx û Vortisburgda û dwatir le salî 1967 - 1970 le zankoy Hamborg zanis̃tekanî Îslamnasîy û Êrannasî û şêwazî gutnewey waney xwênduwe.

Salî1970 birwanamey diktora le bwarî rojhelatnasî û perwerdey berawirdkarîda werdegrêt.

- Le nêwan salanî 1970 ta 1971 le zankoy azadî Berlîn, zanis̃tekanî qanûn û ramyarîy û rageyandinî xwênduwe.

- Le nêwan salanî 1970 - 1979 le zankoy azadî Berlîn zanis̃te syasîyekan û rojnamenûsîy û yasay xwênduwe.

- Le salî 1979 le zankoy azadî Berlîn, birwanamey dîplom le bwarî zansitî syasîyda werdegrêt.

**Karî Ekadîmî:**

- Le nêwan salanî 1955 ta 1961 da sê sal le şarekanî Kerkûk û Hewlêr û sê salîş le şarekanî Bexda û Besre wanekanî fîzîk û matmatîkî gutotewe, le Kerkûk û Hewlêrîş waney Kurdî gutotewe.

- 1971 - 1972 mamosta buwe le însitîtîwtî îtnolojîy zankoy azadî Berlîn.

- 1971 - 1977 mamosta buwe le însitîtîwtî fîlolojî êranî le zankoy azadî Berlîn.

- 1972 - 1976 debête karmendî zansitî le destey lîkolînewey Elmanî.

- 1978 – 1982 profîsorî yarîdeder buwe le Îslam û zmane Êranîyekan le zankoy azadî Berlîn.

- 1978 – 1983 lêkolerî zimanî Farsî û wergêrî taybet be wergêran û wergêranî rastewxo buwe le Berlîn û Bayernî ser be wezaretî rahênanî Munîx.

**Karî Rêkxiraweyî û Pîşeyî û Ramyarî:**

Yekêke le damezrêneranî KAJÎK, (Komeley Azadîy û Jjyanewe û Yekêtîy Kurd, KAJÎK 14\4 \ 1959.

Le salî 1965 legel çend hawrêyekî lewane Biruske Îbrahîm û Letîf Elî, yekêtî neteweyî xwêndkaranî Kurd (NUKSE) dademezrênin.

Le salî 1985 legel desteyek le ekadîmî û nûseran û hunermendanda (Ekadîmyay Kurdî bo zansit û huner) le Stokholim dademezrênin.

Penca û şeş sal xizmetî gewrey be mêjû û ziman û edeb û dozî netewey Kurd kirduwe le jyanî tarawgeda, le zorbey here zorî zankokanî rojawa, sîmînar û korî zansitîy pêşkeş kirduwe û nêwêkî prişingdare le zanko nasrawekanî rojawa.

**Berhem û Nûsîn û Wergêranekanî Cemal Nebez:**

Xawenî zyatir le sed ktêbe be zmanekanî (Kurdî, Erebî, Farsî, Turkî, Elmanî, Îngilîzî, Ferensî, Swydî û Neruycî) legel sedan witar û lêkolînewe be zimane zînduwekanî cîhan.

Ke le nêw bîblyogirafyay Cemal Nebezda, berhemekanî be

(9) zimanî cyawaz saxkirawetewe û bilawkirawetewe.

Cemal Nebez, yekemîn berhemî xoy ke pênc dane çwarxiştekî buwe le jimare (1141)î heftenamey (Jînî) le 19\3\1953da benawî (C, Kilol) ewe bilaw kirduwetewe.

Cêgey amajeye mamosta Cemal Cebez, cige le zimanî Kurdî ke zimanî daykî buwe, çendîn zimanî zîndûy zanîwe û tyayanda baladest buwe, wek zimanekanî: (Erebî, Farsî, Turkî, Îngilîzî, Elmanî, frensî û Belûçî) zor be başî zanîwe û bekarî hênawn, şarezayîyekî başîşî le zimananî Îbrî û Rûsîda hebuwe.

Xizmetekanî degmen û bêwênen le heryek le bwarekanî (Zansit, Mêjû, Edeb, Ziman, Ramyarîy, Kurdnasî, Rojnamewanî, Rojhelatnasî, Yasa û Perwerde) da.

Sed mixabin, 82018/12/ le nexoşxaney (Tşarîtê Vîrşow Kempus Klînîkum) le şarî Berlîn, dIle gewre û mîhrebanekey le lêdan kewt, paşan leser daway Nî‘met xanî xuşkî, termekey le merasîmêkî şayiste û taybetda le şarî Berlîn gerênrayewe bo şarî Silêmanî û le girdî Şêx Marif bexak spêrdira.

# بەڵگەکان




کتێبی بیبلیۆگرافیای دووسەد ساڵی کتێبخانەی کوردی،
(١٨٨٦-١٩٨٦) نوسینی مستەفا نەریمان

ئازادی ١٩٦٠ ، بەغداد چ وەفام ٢٦ل
٢٣٢٠ـ لە پێناوی ئاشتی‌یەکی رەوادا ١٩٧٤ بیری نوێ ، بەغداد چ الرواد ٤٢ل
٢٣٢١ـ لە پێناوی بەهێزکردنی یەکێتی نیشتمانیدا ـ لە بڵاوکراوەکانی رۆژنامەی ئازادی ١٩٥٩ چ الرابطە ٧٦ل
٢٣٢٢ـ لە پێناوی یەکگرتنی زیاتری هێزە شۆڕشگێڕەکانی گەلەکەماندا ١٩٧٧ بیری نوێ ، چ الرواد ٢٧ل
٢٣٢٣ـ لە ڕێگای سەرکەوتنی ئینسانا /و/ لە تورکی‌یەوە ع ٠ و ، نوری ١٩٤٣ ، بەغداد چ مەعارف ٢١ل
٢٣٢٤ـ لە گەروی هیتلەرەوە ـ لە چاپکراوەکانی گۆڤاری دەنگی گێتی‌ی تازە ١٩٤٠ سلێمانی چ ژین ١٤ل
٢٣٢٥ـ لەنینزم /و/ ن٠ت(*) ، ١٩٥٦ شام ـ کەرەم ٥٠ل
٢٣٢٦ـ لینین‌و عەلی /و/ میکائیلی رەشید ١٩٥٧ رەوان ٢٠ل
٢٣٢٧ـ مافی بڕینەوەی دوارۆژ /و/ محرم محمد ئەمین ١٩٧٢ سلێمانی چ کاکەی فەللاح ٦٢ل
٢٣٢٨ـ مانیفیستا کومونیستا /و/ ر ـ درامبیان ١٩٣٤ رەوان ٧١ل
٢٣٢٩ـ مانیفێستی حیزبی کۆمۆنیست /و/ م ـ أ ـ رەوەند ١٩٧٠ بەغداد چ دار السلام ١٢٦ل
٢٣٣٠ـ مرۆڤ‌و دەوروبەر ـ مەسعود محمد ١٩٧٧ لە چاپکراوەکانی کوڕی زانیاری ١٧٦ل

---

★ ن ٠ ت ـ واتە ( نەبەز توفیق ) ـ دکتۆر جەمال نەبەز

٢٦٢

# کتێبی لینینیزم و مەسەلەی نیشتمانی بە تیپی لاتینی

Y . SITALÎN

Kirêkaranî dinya yek bigirin

# LÎNÎNÎZIM

# Û

## MESELEY NÎŞTIMANÎ

**Berpeçdaneweyekî hawr'ê mîşkof**

**û kofalçok û xel'kî tire**

**Gor'înî**
**N . T**

**1956**

## Le wergêr'ewe

Em namîlkeyey Sitalîn ke kirawe be kurdî le ser tercemey Erebî bergî (11)ey komel'e nûsrawekanî Sitalînewe wergîrawe kewa erebîyekey le layen Amojgay Markis-nÊgilis-Lînîn - Sitalinewe amade kirawe, ke ewîs Amojgayeke ser be lijney nawendî partî komonîstî yekêtî Sovyate .

Nameketanim pê geyişt, be tewawî lew komel'e namane eçû ke her lem babetewe lem çend mangey duwayîda le hawr'êkanî tirewe bom hatûwe. Bel'am min bir'yarim da ke her tenha weramî êwe bidemewe, çunke êwe katêk ke meselekan exene rû ser û boryiş bo wuşekanî da enên,û bem core ebine hoy aşkira kirdinî baseke . Be rastî êwe le namekantana be corêkî na rast bo çar kirdinî mesele eçin. Bel'am ewe basêkî tire wa lêreda qisey lê ekeyin.

Ca ba êste bêyine ser meseleke :

**1 . Nasyon**[1]

Zor demêke markisîste rûsekan tiyorî [2] taybetî xoyan heye beramber be ( Nasyon ).

(1) Nasyon : أمة

(2) Tiyorî : نظرية

— 1 —

Nasyon be pêy em tiyorîye, komel'e xel'kêkî nîştecêyew be corêkî mêjûyî pêk hatûwe,û le Ser binçîney beşdarbûn le her çuwar nîşane binçîneyêkeyke xuwareweda peyda bûwe, le ser binçîney yekêtî ziman û yekêtî zemîn û yekêtî jiyanî abûrî û yekêtî pêkhatinî giyanî kewa lew siruştaneda der er ek ewê pey ewitrê kûltûr'î(1) nîştimanî. wek aşkiraye em tiyorîye hemû layek le partekemanda danî piya nawe.

Wek le namekanta derkewê, em tiyorîye be natewaw edene qel'em. Le ber ewe pêşnîyartan waye ke çuwar nîşanekey Nasyon nîsaneyekî pêncemînî bixirête ser. Mebestîşman bûnî dewl'etêkî xoyî û ciyawaze. êweş watan danawe ke eger em nîşaney pênceme ne bêt nasyon ne hatote bûn û hîç bûnîşî bo nîye.

(1) Kûltûr' : ثقافة

— 2 —

Min pêm waye ew nexşeyey ke êwe be pêş-niyar eyden be xoy û nişaney tazey pêncemî-nêwe bo manay ( Nasyon ) hel'eyekî yekcar zile, herweha ne be şêweyekî tiyoryane û ne le barî piraktîkî ( wata siyasîyewe) etiwanrê pakaney bo bikrê .

Be pêy nexşeketan ebê tenha dan bew nasyonaneda binêyin ke wa dewl'etî xoyî û ciyawazyan heye le xel'qî tir, ke nasyonin bel'am hemû nasyone zor lê kirawekan û le dewl'tî serbexo bê beş kirawekan ebê le rîzî nasyonekan layan berîn, herweha têkoşanî nasyone zor lê kirawekan beramber be zor-darî nîştimanî, û têkoşanî gele jêrdestekan be pêçewaney împiryalîzmewe pêwiste le ma-nay ( bizûtnewey nîştimanî ) û ( bizûtnewey nîştimanî rizgarixuwazane) ciya bikeynewe.

Bêcge leweş be pêy nexşeketan, ebê bir'-yar bideyin ke :

— 3 —

(A)- Îrlendiyekan nebûne'Nasyon Cige paş damezrandini ( dewl'eti Îrlendi serbest ) ne bê, bel'am le pêş ewede nasyonyan pêk ne ehêna;

(B) - Nerwicîyekan nasyon nebûn ber le wey Nerwêj le Siwêd Ciya bibêtewe, û ne bûne Nasyon cige paşem ciya bûneweye ne bêt.

(C) - Okraynêkan nasyon nebûn katêk ke Okranya parçeyek bû le Rûsyay Qeyseri, û neşbûne Nasyon cige paş ciya bûneweyan nebê le Rûsyay Sovyati le zemanî kor'î Raday nawendîû ferman rewayî Eskorobadiskîda, Bel'am ser le nuwê le nasyon Çûnewe paş ewey Cumhûriyete Okrayniye Sovyatiyekeyan le gel' Cumhûriyetekanî tiri Sovyata yek xist le yekêti Cumhûriyete Soşyaliste kanî Sovyata.

Eştuwanrê jimareyekî zor lem core mîsalane bihênrênewe.

Ca aşkiraye ke nesşeyek em core encame

— 4 —

pir'ûpûçaney lê der biçê, şayanî ewe nîye ke bibête nexşeyêki zanyari bidrête qel'em.

Nexşeketan le barî piraktikîyewe ( wata siyasîyewe ) hîç gumanî tiya nîye ebête hoy pakane kirdin bo zordarîy niştimani û Împiryalizmî kewa mil'ozimekanî hergiz dan be weda nanên ke nasyone zor lê kirawe beşxûrawekan nasyonî rasteqînen, çunke emane dewl'etî niştimani ciyawazyan nîye, û way da enên ke em h'al'e heqyan edate dest bo çew sandinewey em nasyonane.

Îtir hîç pêwîst nakat ke bil'êm nexşeketan ebête hoy bexşînî regezperiste borcuwazêkanî cumhûrîyete sovyatêkeman, ewaney ke hewil' eden bo ewey îspatî biken ke nasyone Sovyatêkan le nasyonî kewtûn paş yekxistinî cumhûrîyete Sovyatiye niştimanêkanyan le yekêtî Cumhûrîyete soşyalistekanî Sovyata.

Ewe meseley (dest lê dan) û (çak kirdin) î

— 5 —

tiyorî markisyaney Rûsîye le barey Nasyonewe.

Îtir le yek şit bewlawe hiçî tir namênê, ewîş dan piyanane be tiyorî markisyaney Rûsida le barey nasyonewe kewa taqe tiyorîyêkî rasteqineye.

## (2). Peydabûnî Nasyon û Gor'anyan

Yekêk le hel'e qursekantan eweye ke herdûktan be yek çaw er'wanine hemû ew Nasyonaney ke êste hen, û hîç ciyawazîyekî seretayî le beyinyan$_a$ nabînin.

Le cîhana gelêk Nasyonî ciyawaz hen. asyonî wa hen le dewrî raper'înî sermayedarîda gor'anyan be serda hatûwe, katêk ke borcuwazêtî ser û guwêlakî derebegî ekutayewe û pert û bil'awîy derebegî le naw ebird, û gişt layekî Nasyonî koekirdewe û be yekêwe elikand. Eme eweye ke nawî

Nasyonî (Nuwê) y be serda bir'awe.

Èwe waezanin ke Nasyon her bûwe û derkewtûwe hetawekû le pêş Sermayedarişda. Bel'am çon ebê derkewtibê û bûbêt le pêş sermayedarîda, le dewrî Derebegîda, katêk ke wul'atan beş beş kirawin be çend Mirnişînêki serbêxoy le yek ciyawazewe ke be şîrazey niştimanîyewe be yekewe bend nekirabûn, bel'kû le ser eweşewe , zor be tundî nefrînyan le pêwisti ew şîrazane ekird. Nasyon be pêçewaney qise nar'astekanî êwewe hergîz ne bûwe û ne şiyawe bibê le hîç dewrêkî pêş sermayedarida, çunke bajêr'î nîştimanî hêşta ne bûwe, berweha nawç ey abûrî û kûltûer'î û nîştimanî ne bûwe, le ber ew hoyaney, ke eşê pert û bil'awîy abûrî mîlletêkî nasraw le naw biba û le hemû nîştimanêkda çend beşêk ko bikatewe, ke hêşta parçe parçeye, ew hoyane hêşta ne hatûne bûn.

— 7 —

Şitêkî diyare ke regezekanî Nasyon , mebestîşman le yekêtî ziman û zemîn û kûltûr' û hetad ...! le asmanewe ne kewtûwete Xuwarewe, bêl'kû bere bere le dewirî pêş sermayedarîda peyda bûwe. Bel'am em regezane ew h'ele hêşta le şêwey gerada bûn, û le çaktirîn doxya çi ne bûn cige seretayek ne bêt bo damezrandinî Nasyon, wata tuwanay damezrandinî le paşe rojda le katî peyda bûnî zurûfî guncawî nasrawda. em tuwanayeş ne bûwe şitêkî rasteqîne cige le dewrî raper'înî sermayedarî û bajêr'e niştimanêkey û nawçe abûrî û kû 'tûr êkanya ne bêt.

Ca bem boneyewe pêwîste le serman destêk rabikêşîn bo wuşe berizekanî Lînîn le barey meseley peydabûnî Nasyonekanewe, ke le namîlkey nawbirawya be(ewan e hawr'êy gel nîn ) û çon le gel' soşyaliste

dîmokratiyekanda ecengên? basî kirdûwe, Lînîn le Katî demeteqê kirdinya le gel' Mîxayiloviskî gelperist, ke pêy wabûwe peydabûnî peywendî nîştimanî û yekêtî nîştimanî encamî gor'anî peywendî hozayetîye, emey xuwarewey gutûwe:

« kewate, peywendiye niştimanîyekan dirêjbûnewe û peresendinî peywendiye hozayetîyekanin! Aşkiraye kak Mîxayilviskî barî serincî xoy beramber be mêjûy komêl' lew çîroke minal'aneyewe wer egirê kewa qutabiyekan be deriz ey xuwênin. mêjûy komel', be pêy em bîrûbawer'e bê ser û pêye, be kurtî eweye ke her le seretawe xêzan bûwe, ke xêzaniş şaney hemû komel'êke ... paşan xêzan geşey kirdûwe, be xeyal'î ew, û bûwe be hoz, bel'am ke hoz geşey kirdûwê bûwe be dewl'et. Ca eger kak Mixayiloviskî be fîzêkewe em gir'gal'e

minal'aneye bil'êtewe diyare ewe çi nîye cige bel'geyek ne bê, le pal' gelêk bel'gey tira, bo ewey ke hîç core zanistîyekî nîye tenanet le barey beserhatî mêjûy Rûsyawe. Xo eger bitwanrê qise le nawçey hozayetî bikirê le rûsyay kona, hîç gumanî tiya nîye ke em peywendiye hozayetîyane nebûwe hetawekû le sedekanî nawer'as-tîşda, wata le dewrî sel'tenetî Moskoda, manay eweş waye ke dewl'et le ser binçîney yekêtî yek durust bûwe ke hergîz hozayetî ne bûwe, bel'kû şitêkî naw Xoyî bûwe, wata mil'ikdare gewrekan û muteweli kil'î-sekan rencberyan le gişt layek wer egirt, û ew meşaîyataney ke wa bem core pêk hatibû yekêtîyekî zemînyaney rût bû. Le gel' eweşda ne egunca lew dewreda bas le peywendî niştimanî bikrê be manay taybetî wuşe, çunke dewl'et beş beş bû bû bo çend

parçe zewiyek, bigre hetawekû hendê car, bo çend mîrnişînêkî le yek ciya kewa her yeke şuwênewarêkî zîndûy h'ukmî xoyî pêşû û siruştî h'ukmî idarî pêwe diyar bû, hendê car be leşkirî taybetîyekeyewe (Boyare naw xoyiyekan be leşkirîtaybetî xoyanewe eçûne şer), û sinûrî gûmirgî xoyan hebû û herweha. Meger dewrî taze bil'êt le mêjûy Rûsya (ewîş le nizikey sedey hevdemînewe) kewa be çeşinêkî rast hemû em qel'emr'ew û zewî û mîrnişînane çûne naw yek çûne naw yekêkî rasteqîne û bûne taqe yekêk. Em çûne naw yekeş sebaret be peywendî hozayetî nebû cenabî kak Mîxaylovişkî, hatawûkû sebaret be dirêjbûnewe û peresendinîş nebû, bel'kû sebaret be al'ûgor'î rû le ziyadî şitûmek bû le beynî em qel'emr'ewaneda, û ziydbûnî le ser xoy hênan û birdinî kûtal' û reg da kutanî bajêr'î

naw xoyî piçkole bû le bajêr'èki taqûtenha-
da bo gişt Rûsya û le ber ewey ar'astekeranî
em royiştine û dest be sera giranî bazirgane
sermayedarekan bûn, diyare damezrandinî
em peywendiye nîştimaniyane le damezra-
ndinî peywendî borcuwazî bew lawe hîçî tir
ne bû». «temaşay Berg . 1. la. 72 - 73 Bike»

Ewe bû meseley peydabûnî ewey pêy ewitrê Nasyonî (Nuwè).

Borcuwazêtî û parte regezperistekanî heta êsteş lem dewireda her hèzî pêşr'ewî serkirdeyî em nasyonane bû. Bela'm peyjey çînayetî le nawî Nasyona bo pêkhênanî yekêtî Nasyon, û firawan kirdinî zewî le layen Nasyone we le rêgey dagîr kirdinî zewî na niştimanî, û bawer'nebûn û qîneberayetî berember be Nasyonanî begane, û demkut kirdinî kemayetîye netewayetêykan, û yek

girtini le bereyekda le gel' Impiryalizim, ewe ebête xorakî mêşki û komel'ayetî û siyasî em Nasyonane.

Em çeşine nasyonane ebê be corêk rîz bikrên wek nasyonane borcuwazî lewaneş wekû nasyonî Ferensî û Înglizî û Îtalî û nasyonî Emerîkay jûrû û gelêk nasyonî tir kewa lewane eçin. û le rengi ewane nasyonî Rûsî û Okranî û Teterî û Ermenî û Corcî û gelêk nasyonî tirî Rûsya ke wextî xoy nasyonî Borcuwazî bûn ber le wey diktatorî prolîtarya cêgîr bibê û rijimî sovyatî le wul'atekemana regdabikutê,

Aşkiraye ke çarenûsî em nasyonane bestirawe be çarenûsî sermayedarîyewe, manay waye le gel' rûxanî sermayedarîebê em nasyonane le ser şano ne mênin.

Namilkekey Sitalîn Markisîzim û meseley nîştimanî em nasyone borcuwazyane egrête

ber çaw katêk el'ė : « Nasyon tenha wuteyekî mêjûyi niye, bel'kû wuteyeki mêjûyiye bo dewrêkî nasraw ewiş dewri sermayedarî râ le berzîye». û «Çarenûsi bizûtinewey nîştimani, be xoy û derûne borcuwazêkeyewe, be wêneyeki suruşti bestrawe be çarenûsi borcuwazêtiyewe » . û rûxanî duwayi bizûtinewey niştimanî nayete di cige le gel' rûxanî borcuwazêti ne bêt» û «aştî bin best nabê be tewawî cige le dinyay soşyalizima ne bit» .

Eweye meseley nasyone borcuwazêkan.

Bel'am hendê nasyonî tirîş hen le cihana. Ewaneş Nasyone tazekanî sovyatin , kewa berew gor'an û pêgeyiştin er'on le ser binçîney nasyone borcuwazê konekan, paş rûxanî sermayedarî le rûsyada, û paş derkêşanî rîşey borcuwazêtî û parte regezperistekanî, û paş cêgirbûnî rijîmî sovyatî.

Çinî kirêkar û parte Înternasyonalistekey(1) ew dû hêze pêk dênin kewa em nasyone tazane be yekewe elikênê û pêşrewiyan ekat. Şuwênewari(2) giyanî û komel'ayeti û siyasî em nasyonane: yekgirtinî çinî kirêkar û cûtyare zeh'melkêşekanî naw nasyone bo rîşekêşkirdinî sermayedarî be nawî damezirandinî soşyalîzimî serkewtûewe paşan le naw birdinî şuwênewarî zordarî niştimanîye be nawî çunyeki û gor'anî nasyonekan û kamyatîye nelawayetîyekanewe gor'anêkî serbest, duwayî ne hêştinî paşmawey regezperistîye be nawî cêgîrkirdinî dostayeti le beynî gelana û binbest kirdinî internasyonalîstîye, paşan damezrandinî bereyekî yekgirtûwe legel' hemû nasyone zor lê kirawe beşxurawe-

(1) Înternasyonalîst : أممي

(2)Şuwênewar : اثر

kan, bo têkoşan be pêçewaney siyaseti hel' kutaneser û cengi dagirkirdin, û bo têkoşan be peçewaney Împiryalizimewe.

Em çeşine nasyonane ebê bew pêye riz bikrên ke nasyoni soşyalistin.

Em nasyone tazane le ser binçiney nasyone borcuwaziye konekan derkewtin û gor'an le encamî rişekêş kirdinî sermayedarî û le rêgey ser hel'daneweyan be giyanêki soşyalizimiyewe. Kes natuwanê bil'ê em nasyone soşyalistiyaney êstey yekêtî sovyat, wata nasyonî Rûsi û Okranî û Beler'ûsî û teterî û Başkîrî û Ozbekî û Qazaẍî û azirbaycani û corci û ermeni û gelê nasyonî tir, ciyawaziyeki binçineyîyan heye legel' nasyone konekan, wata legel' ew nas yonaney kewa legel' Borcuwazêtîda danû yan ekul'a le Rûsyay kona, û le yektiriş ciyawazbûn saitir le rûy pekhatinî

cînayêti û ruxsarî manewîyewe bė yan le rûy deskewit û hewil'dani siyasî û komela-yetiyeçbe ewe basi dû çeşine nasyon bû ke dewirekanyan her mêjû bû.

Ėwe herdûktan leser em kare pêk nayen, ewis eweye ke çarenûsi nasyonekan, û lem meydaneda nasyone borcuwaziye konekan, bibesitrê be çarenûsi sermayedariyewe. Herweha herdûktan pêknayen le ser ew basey ke el'ê be nemanî sermayedarî nas-yone borcuwa.iye konekan namênin· Ey kewate çarenûsî em nasyonane ebė be çîy-ewe bibesitrê eger be çarenûsî sermayeda-rîyewe ne besitirê? Aye şitêki ewende gira-ne tê bigeyin ke legel' pêçanewey dewirî sermayedarî ebê dewiri nasyone borcuwa-zêkaniş ke bêçûy sermayedarîn bipêcrête-we? Aye êwe bir'watan nîye ke nasyone borcuwaziye konekan etwanin bibin û bi-

gor'ên le say sêbêrî rijimî sovyatî û le say sêberî diktatorî pir'olîtarîda ? le hiçman kem nebû le we ne bê ...

Êwe lewe etirsin ke nemanî ew nasyonaney ke le dewirî sermayedarîda hen şan be şani nemani gişt nasyonekan bêt, wata şan be şanî nemanî hemû nasyonêk bê. boçi, û be çi bel'geyek? Aye êwe ber'astî ewe nazanin ke bêcige le nasyone borcuwazêkan nasyonî tiriş hen, nasyoni soşyalisti wa ke zor yekdigîrtir û zindû tir be corêk legel' hiç nasyonêkî borcuwazî na pêwrên?

Ewe hel'eketane be taybetî, çunke êwe le nasyonî borcuwazî bewlawe nasyonî tir na hênine ber çaw, le ber ewe çawtan gelê kiztir bûwe lewey ke sedeyek be tewawî bibînin, sedey peydabûnî nasyone soşyali-stekanî yekêtî sovyat ke le ser tepol'kekanî

nasyone borcuwazê konekanewe hel'qul'a-win.

A Eweye meseleke, çunke nemanî nasyone Borcuwazêkan manaî nemanî gişt nasyonekan nîye be corêki têkr'ayî, bel'kû manaî nemanî nasyone borcuwazêkane û hîçî tir. ca le ser tepol'kekanî nasyone borcuwazêkanewe nasyoni tazey soşyalîstî hel' equl'ên û egor'ên, zor zor yek digîrtir le her nasyonêkî borcuwazî to bîgirî, çunke ew nasyonane dûrin le nakokî sexitî çînayetîyewe kewe ebête xore bo giyanî nasyone borcuwazêkan û çunke deskewtî gel ziyatir egirêtewe be corêk le gel'hiç nasyonêkî borcuwazîda na pêwrê.

### 3 . Paşerojî nasyonekan û zimane niştimanĕkan

Êwe hel'eyekî zor zil eken katêk dewrî zal'bûnî soşyalîzim le yek wil'ata û dewrî

zal'bûnî soşyalizim le sinûrêkî cîhanîda wek yek edene qel'em, guwaye el'ên ke tuwana û pêwistî heye bo ne hêştinî ciyawaziye nîştimanêkan û zimane niştimanêkan û dozinewey taqe zimanêkî giştî, nek tenha le lewirî zal'bûnî soşyalizim le sinûrêkî cihanida, bel'kû herweha le dewirî zal'bûnî soşyalizim le yek wil'ata. Êwe lêreda gelêk şitî zor ciyawaz legel' yek têkel' eken wata ( ne hêştinî zordarî niştimanî ) û ( ne hêştinî ciyawaziye nîştimanêkan ) legel' yek têkel' eken, herweha (ne hêştinî sinûrî niştimanî dewlet) û (le naw çûnî nasyonekan) û (çûne naw yek) î nasyonekan lêgel' yek têkel' eken.

Her ebê dest rabikêşin bo ewey ke hergîz cayiz nîye bo Markisistekan ke em mefhûme le yek neçûwane têkel' biken, çunke le layême, le wil'atekemana, zor demeke

zordarî niştimanî le naw birawe, bel'am eme hiç ewe na geyenê ke ciyawaziye nîştimanêkan la birawin, û nasyonekan le wil'atekemana le nawçûn. Le lay ême, le wil'atekemana, demêke merizi[1] niştimanî dewil'et le naw birawe û pasewani ser sinûr hel'girawe û gûmirig la birawe, legel' eweşa hiç eme ewe nageyenê ke nasyonekan çûne naw yek û zimane niştimanêkan le nawçûn, û em zimanane gor'awinewe be taqe yek zimanî giştî, her zimanêk bê, bo hemû nasyonekanman.

Êwe berdûktan razînîn lew xutbeyem ke le danîşgay komonistî zeh'metkêşanî rojhel'ata dam (le sal'î 1925)da, û le wêda ew qiseyem be diro xistewe ke el'ê le dewirî zal'bûni soşyalizimda **le taqe** wil'atêkda, û

(1) meriz : sinûr

bo wêne le wil'atekey xomana, zimane nîş-timanêkan le naw eçin (Awa!) û nasyone-kan etuwênewe û taqe zimanêki giştî der ekewê û şûwênî zimane nîştimanêkan egirêtewe.

Êwe pêtan waye em qiseyey min pêçew-aney ew base be nawbangey Lînîne ke el'ê: Amanci soşyalizim tenha ne hêştinî let let bûnî mirovayetî nîye bo çend dewl'etêk û le naw birdinî hemû le yek dûriyek niye le beyinî nasyonekan, û tenha nizik bûnewey nasyonekan niye bel'kû çûne nawyekiş-yane.

Bécige leweş pêtan waye qisekem dûba-re pêçewaneye legel' basêkî tirî Lînînda ke el'ê : Le dewirî zal'bûnî soşyalizima **le sinûrêkî cîhanîda** ciyawazîye nîştimanê-kan û zimane nîştimanêkan dest be lenaw-çûn eken, û le paş em zal'bûne taqe zima-nêkî giştî cêy em zimane nîstimanyane egirêtewe.

— 22 —

Emeş, hawr'ěyîne be carêk na raste, eme rê hel'e kirdinêki tewawe.

Lemewe ber le serewe wutim cayiz nîye bo markisîstekan rûdawi le yek necû têkel' biken wek «zal'bûnî soşyalizim le taqe wil'atêkda» û «zal'bûnî soşyalizim le sinûrêkî ciyhanîda» û biyan xene dû tay terazûyekewe. Çunke nabê le bîrman biçê ke em rûdawe le yek neçûwane wêney pêçewaney dû dewirî gelêk le yek ciyawazin, nek her tenha le rûy katewe (ew şitey kewa yekcar giringe) yek le yektirî ciyawazin. Bel'kû be mahîyetîş le yek ciyawazin.

Ew şitey kewa hestî bawer' nebûnî niştimanî û ciya kirdinewey niştimanî û qînberayetî niştimanî û be yekadanî nîştimanî ehurûjênê û piştî egirê bê guman core hest kirdinêkî ( zig mak ) niye be kîney niştimanî, bel'kû hewil'danî Împiryalizime bo milkeç kirdinî nasyonî tir û tirsî em nas-

yonaneye le xeteri bendegeri niştimani . hîç gumani tiya niye madam Impiryalîzimî cîhanî beye diyare ew hewl'e û em tirse her emênin, le encama bawir' nebûni niştimanî û ciya kirdinewey niştimanî û qineberayetî niştimanî û be yekadanî niştimani herweha emêninewe le zurbey zori wil'atekana. Ca aye etwanrê be dil'niyayi biwitrê ke zal'bûnî soşyalizim û nemanî Împiryalîzim le taqe wil'atêkda manay nemanî Împiryalizim û zordarî niştimaniye le zorî wil'atanda? Aşkiraye eme na şe. Bel'am le mewe der ehênirê ke zal'bûnî soşyalîzim le taqe wil'atêkda egerçî be şêweyekî karîger Împiryalizimî cihanî bê hêz eka, bel'am ne :urûfî pêwist durust eka û ne eştuwanê durustî bika bo çûne naw yekî nasyonekan û zimane niştimanêkanî dinya le taqe yekêkî giştiya

Dewrî zal'bûnî soşyalîzim le sinûrekî cîhanî-da ci, aye le gel' dewrî zal'bûni soşyalîzim le taqe wil'atêkda, ber le hemû ştêk, leweda ke Împiryalîzim le gişt wil'atanda rîşekêş ekirî, û arezûy ser-şor kirdin be nasyonanî tir nahêl'rê û herweha metirsî xeterî bendegerî nîştimanî le naw ebirê wek yek, dîsan bawir' nebûnî niştimanî û qînebe-rayetî nîştimanî le binçînewe hel' ekendirê, û hemû nasyonekan le taqe rijîmêkî abûrî soşyalîsti cîhanîda yek exirên, be we zurûfî rasteqîney pê-wîst peyda ebê bo çûne nawyeki hemû nasyone-kan bere bere le taqe yekêkda.

Ewe ciyawazî binçineyî beyinî em dû dewire bû.

Bel'am ew encamey le me wer egîrê eweye têkel' kirdinî em dû dewire ciyawaze û xistinyane naw dû tay terazûyekewe manay be hel'eçûnêkî gewireye hergîz na bexişrê. Bam biger'êyinewe ser wutarekem ke le danîşgay komonîstî zeḣ-metkêşanî rojhel'atda dawme, û le bareyewe wutrawe :

«Le barey peydabûni taqe zimanékewe qise eken ( be wêne kawtiskî ) bo giştmirovayetî û nemanî hemû zimanekanî tir le dewirî soşyalîzima. min zor kem bawir'im bem tiyorîye beye, tiyorî taqe zimanêk ke hemwan bigrêtewe. û taqi kirdinewe be hemû ı!ı arêkda, pişti em tiyorîye nagirê bel'kû be diroy exatewe. heta êste iş û kar be corêk royiştûwe ke şorişi soşyalisti jimarey zimanekani kem ne kirdotewe bel'kû ziyadî kirdûn, çunke şoriş be hurûjandini qûl'tirîn rîzî mirovayetî û pal' pêwenanî bo ser şanoy siyasî, bo berengarbûni jiyanî taze zincîreyekî tewaw lew netewe tazane ra eper'enê kewa lewe pêş hemû nasyonî ne nasiraw bûn yan kem nasiraw bûn. kê bir'way ekirid ke le Rûsyay Qeyseri kona nizîkey penca nasyon û netewe bijî? Bel'am şorşi Oktober kotû zincirî konî piçir'and û komel'êk lem gel û netewe le bîr ne mawaney pal' pêwe na bo ser şano û jiyanêkî taze û gor' anêkî nuwey kirdin be bera.

Lem pirse[1] wergîrawewe der ekewê ke min

(1) Pirse : جلة

beramber xel'qî wek Kawtiskî rast bûmetewe ke hemîşe û heta êsteş fir'î be ser meseley nîştimaniyewe niye, û le rijîmî gor'anî nasyonekan tê naga û agay lew hêze mezine nîye ke le dewam kirdinî nasyona heye, û tuwanay çûne naw yekî nasyonekan be şitêkî rast ezanê hetawekû le pêş zal' bûnî soşyalizima be maweyekî dirêj wata le dewirî rijimî borcuwazê dîmokiratêkana, û be Fîzêkewe be (kirdewey)el'manekana hel'eda katêk ke xel'qî çîkya (Bohimya) yan qût da paşan be şêweyekî zor sexîfane pêy waye ke çîkekan bûne Cermen, û çîkekan paşerojyan niye wek (Nasyon).

Bécge leweş lem pirse wergîrawewe wa der ekewê ke min le wutarekema mebestim le dewirî zal'bûnî soşyalizim ne bûwe le sinûrêki Cihanîda, bel'kû mebestim le

dewrî zal' bûnî soşyalizime le taqe wul'a-têkda û hicî tir. Lem şuwêneda danim piya nawe, ( û êsteş danî piya enêmewe ) ke de-wirî zal'bûnî soşyalizim le taqe wul'atêk-da, zurûfî pêwîst amade nakat bo çûne naw yekî nasyonekan û zimane niştimanêkan-yan, û em dewire, be pêçewanewe, nawçe-yekî minasib amade ekat bo jiyanewe û geşe kirdinî ew nasyonaney kewa le rabûr-dûda çewsawey destî Împiryalizimî Qey-serîyewe, û îmr'o şorişî sovyatî rizgarî kir-dûn le çing zordarî niştimanî.

Duwayî, lem bende wergîrawewe der ekewê ke êwe serincî ew ciyawazîye gewi-reyetan ne dawe ke le beynî dû dewirî mê-jûyî ciyawaza hen, û be pêy ewe le meẍzay wutarekey Sitalin ne geyiştûn, û encamî ew hemûweş eweye herdûktan le naw hel'e taybetiyekanî xotana rêgetan wan kirdûwe.

Ba bêyine ser basekanî Lînîn le barey le naw çûn û çûne nawyekî nasyonekanewe paş zal' bûnî soşyalizim le sinûrêkî cihanîda

A eweş yekêke le basekanî Lînîn ke le wutarêkî Lînînewe wergîrawe be nawî (şorişî soşyalizim û heqî Nasyonekan le bir'yarî çarenûsa). kewa le sal'î (١916) da bil'aw kirayewe, û nazanrê sebaret be çî le namekantana be şêweyekî tewaw wertan ne girtûwe :

«Amancî soşyalizim her tenha nehêştinî let let bûnî mirovayelî nîye bo çend dew-l'etêk û le naw birdinî hemû le yek dûrî-yek nîye le beyinî nasyonekana, û le yek nizîk kirdinewey nasyonkannîye, bel'kû çûne naw yekişyane... û wek çon mirova-yetî natuwanê biçête dewirî le naw birdinî çînekanewe cige paş maweyekî întîqalî ne bê ke diktatorêtîy zor lê kiraw eybir'ê, awaş

mirovayelî natuwanê bigate çûne naw yekî nasyonekan, ew çûne naw yekey kewa bûnî bo nîye cige paş maweyekî întiqalî nebê le rizgar bûnî tewawî hemû nasyone zor lê kirawekan, wata serbestî ciyabûneweyan» . « Temaşay k. 1 , la. 40 bike » .

A ameş basêkî tirî Lînîne ke ewiştan be tewawî wer negirtûwe.

Madam Ciyawaziye niştimanêkan û ew ciyawaziyaney kewa nasyonekan le yektir hel'awêrê le beyinî gelan û wul'atanda heye - û em ciyawaziyane emênin hetawekû hatine dî diktatoretî pirolitarya le sinûrêkî cîhanîda bo maweyekî dirêj û zor dirêj - diyare ewey ke yekêtî teknîkî Înternasyonalist gerekêtl bo bizûtinewey komonîstaney kirêkaran le gişt wul'atanda ne hêştinî heme renge ciyawazîye nîştimanêkan û le naw birdinyan nîye « ke eweş le

barî êstemana wek zinde xew waye» . Bel'-kû tetbîqî sereta binçîneyekanî komonîzi-me «wata desel'atî sovyatî û diktatorêtî pi-rolitarya» be şêweyek ke bitwanrê, le zurû-fêkî diyarî kirawa, em serelayane be corê-kî rast bigor'rên, û wayan lê bikirê ke le gel' ciyawazîye nîştimanêkan û ciyawazîye nîştimanêkanî dewl'etêkî xoyî biguncê, pa-şan tetbîq bikirê » . « Temaşay k. 25, la, 227 bike».

pêwîste dest rabikêşin bo ewey ke em bende le namilkekey Lînînewe wergîrawe ke nawî « nexoşî (çepr'ewî) minal'aneye le komonîzima ». ke le sal'î 1920 da bil'aw ki-rawetewe, wata paş zal' bûnî şorişî soşya-lîzim le taqe wul'atêkda, û paş zal' bûnî so-şyalîzim le wul'atekemana.

Lem bende wergîrawanewe der ekewê ke Lînîn rêy le naw çûnî ciyawazîye nîş-

timanėkan û çûne naw yekî nasyonekan na bestė be dewirî zal' bûnî soşyalizimewe le taqe yek wul'ata, Bel'kû tenha ey bestė be dewirî **pa**ş hatine di diktatorėtî piroli-tariyewe le sinûrėkî cihanîda, wate ey bes-tê be dewirî zal' bûnî soşyalizimewe le giştwul'atanda, katê ke binçinekanî abûrî û soşyalîstî cihanî da enrê.

Herweha lem bende wergîrawanewe der ekewê ke Lînîn bewil'danî ewaney ke cya-newê rêgey le naw çûnî ciyawaziye nîşti-manêkan bi bestin be dewirî zal' bûnî soş-yalîzimewe le taqe wul'atêkda, wata le wû-l'atekemana, be zînde xew edate qel'em.

Bêcge leweş, lem bende wergîrawanewe wa der ekewê ke Sitalîn be tewawî le ser heq bûwe katêk le wutarekeya ke le daniş-gay komonîzimî zeh'metkêşanî rojhel'at dawye û tuwanay le naw çûnî ciyawazîye

niştimanêkan û zîmane nistimanêkanî be rast ne zanîwe le dewirî zal' bûnî soşyalizima le taqe wul'atêkda, wata le wul'ate kemana. Bel'am êwe be carê le ser na heq bûn ke layengirî şitêktan kirdûwek legel basekey Sitalina dû berey nakokin.

Duwayî lem wergîrawanewe der ekewê ke êwe be têkel' kirdinî dû dêwirî ci awaz bo zal' bûnî soşyalizim, le Lînîn ne ge iştîn û pêr'ewî Linin tan gêr' kirdûwe le barey mesely niştimanîyewe, encamî emeş eweye ke bê ewey desel'atitan be ser xotana bi bê, be rêgeyekda kewtûnele rê ke hîç mafî be Lininizimewe nîye.

Şitêkî rast nîye kewa bizanrê nehêştinî Ciyawaziyê niştimanêkan û le naw çûnî zimane niştimanêkan rastewxo pêk dên paş rûxanî Împiryalizimî cîhanî û be çaw tirûkandinêk û le le rêgey ew şitewe ke etwanrî pêy biwitrê der kirdinî merasim le serewe.

Hiç şitêk nîye lem bel'aye quristir bê. Çun-ke hewil 'dan do tuwandinewey nasyon le rêgey der kirdinî merasîmewe le serewe û le rêgey zor lê kirdinewe manay waye piyaw ebê be bûkeşûşeyek be best impiryalizim-ewe û manay ser negirtinî meseley rizgar-bûnî nasyonekane, û zinde de çal' kirdini meseley rêkxistinî herewez û birayeti bey-w.î nasyonekane. em çeşine'siyasetane ha-wtay siyaseti tuwandinewey nasyonekane. Bê guman herdûktan ezan n ke siya seti tu-wandinewe be carêk konkiriti markisîzi-mî Lîninizim êpî ekatewe. çunke siyasetêki dujminaneye legel' gel û xuwênexuwêy şo-rişe, bew pêyey ke siyasetêkî kuşindeye. Bêcige le weş,şitêkî Aşkiraye, ke nasyone-kan û zimane nîştimanêkanyan hel'dawêr-ên be xo ragirtinî be enbaze û hêzî meziny-an le derengar kirdinî siyaseti tuwanewe-da. Turkekan şeyday siyaseti tuwandinew-en, û pistirînî ewanen ke em siyaseteyan be kar hênawe, ewe bû nasyone. Bel'qanêkan-yan azarda û le pelûpayan xistin, bel'am le

— 34 —

wuzeyana ne bû qir'yanken, nek her tenha eweş bel'kû na çar bûn be mil keç kirdim û Rûs piristekan leRûsyay qeyserida û Cermen periste Birûsie El'emanekan kewa çepyan ne bû le turke millet tuwênerewekan,he 'yan kutaye ser nasyonî Pol'onî û le sed sal'ziy-tir eşkenceyan dan, herweha Èranî û Tur-ke millet tunerewekan mawey sedan sal' hel'yan kutaye ser gelî Ermenî û Corcî û azaryan dan û hewil'yan da bo qir'kirdin-yan, le gel' eweşa neyan tuwanî em gelane le naw berin, nek her tenha eweş, bel'kû be pêçewanewe naçar bûn be milkeç kirdin.

Pêwiste hemû em şitane bîgirîne ber çaw hetawekû be şêweyekî rast eqine rêgey rûdawe çawer'wan kirawekan lêk bideyne-we le barî serincî gor'ani nasyonewe, ras-tewxo paş rûxanî împiryalîzimî Cihanî.

Hel'eye wa bizanin ke yekemîn piley dewirî diktatorêtî cihanî pirolitarya ebête seretay le nawçûnî nasyonekan û zimane niştîmanêkan, seretay durust kirdinî taqe zimanêkî giştî. Be pêçewanewe, yekemîn

pile ke be carêk zordarî nîştîmanî tiya le naw ebirê, ebête piley neşûnimay nasyone çewsawekanî peşû û zimane nîştimanêkanyan û geşe kirdinyan, û ebêle piley çunyeki le beyinî nasyonekana, û piley rişekêş kirdinî kembawir'î beyinî nasyonekan, û piley damezirandin pitew kirdinî peywendiye Înternasyonalistekan le beyinî nasyonekana.

Tenha le piley dûwemî dewirî diktatorêtî cihanî pir'olitarîda, û be qed ewendey ke tape abûriyekî soşyalistî cihanî peyda ebê, û cêyabûrî sermayedarî cihanî egirêtewe, tenha lem pileyeda şitêk der ekewê le zimanî giştî eçê, çunke tenha lem pileyeda nasyonekan hest be pêwîstî bûnî tape zimanêkî Înternasyonalistî muşterek eken le pal' zimane nîştimanî xoyana, bo asan kirdinî amşo kirdin û rayî kirdinî herewêzî

abûri û xuwêndewarî û siyasî. Bem core lem pileyeda zimanê kî Înternasyonalisti giştî ebê şan be şanî zimane nîştimanêkan. Eşê ke le sēretaea taqe nawçeyeki abûrî cihani giştî da ne mezirê bo hemû nasyonekan legel' zimanêki giştî, bel'kû çend nawçeyekî abûrî kişwerî da bimezirê bo çend tîreyek nasyoni serbexo, legel' zimanêki serbexo bo her tîreyek lew nasyonane, tenba le encamî eweda em nawçane yek egirin le taqe nawçeyekî giştî Cihanida bo abûri soşyalisti legel' taqe zimanêkî giştî bo hemû nasyonekan.

we le piley dûwemi dewirî diktatorêtî cihani pirolîtarîda, katê ke rijimî abûri soşyalisti cihanî binbest ebê be radeyekî kafî, û soşyblîzim eçête̦giyanî gelanewe û katêk gelan be şêweyekî piraktiki iqnai ebin be çakey zimane giştêke le çaw zimane nîşti-

manêkane ew demê ciyawazî niştimaniû zimanekan dest be neman eken, û zimanêkî cîhanî giştî bo hemwan cêgey ewane egirê.

Ewe be bîrûbawir'î min wêneyeki teqrîbî bû bo paşe roji nasyonekan, wêney gor'ani nasyonekan le rêgey çûne naw yekyanewe le paşe roja.

**4. Siyasetî partî[1] le meseley iştimanîda**

Yekêk le hel'ekantan eweye k êwe wa er'iwanine meseley nîştimani nek wek beşêk le meseley giştî le barey gor'anî komel'ayelî û siyasi komêl'ewe, ke her bem mesele giştiyewe bestirawe, bel'kû wek şitêkî serbexoy berdewam ke be dirêjayî mêjû ne le rewiştya egor'ê û ne le suruştya egor'ê gor'anêkî binçîneyî . le ber ewe eweyke markisîstêk ey binê êwe nay binin, wata

(1) Mebestî le partî komonîstî yekêtî Sovyate.

nazanin ke meseley niştimanî heta ser su-
ıuştêki tenhay niye, bel'kû suruştî bizûti-
newey niştimani egor'ê û pêsipêrrawêkanî
wek xoy namênê be pêy ciyawazî pilekanî
gor'ani şoriş.

Ewey be şêweyekî mentiqyane ewe lêk
edatewe ew waqîye pir' le daxeye, waqîyi
ewey ke êwe bem asanîye çend dewirêkî le
yek neçû le dewirekanî gor'ani şoriş têkel'
yek eken û eyan xene beramber yek, hesti
pê naken ke gor'anî suruşt û pêsipêrrawî
şoriş le pile ciyawazekanî gor'ana ebête
hoy çend gor'anêkî pêwist le suruşt û pêsi-
pêrrawî meseley niştimanî, û pê be pêy ewe
siyasetî partîş egor'ê le meseley nîştimanîda
û le encamda siyasetî partî le meseley niş-
timanîda, ew siyasetey ke bestirawe be ta-
qe dewirêk le dewirekanî gor'anî şorişewe,
na tuwanrê be fopizî lem dewire ciya biki-

rêtewe û he ber zor biguwêzirêtewe bo dewirêkî tir.

Markisiste Rûsekan be wuçan eger'anewe ser em seretaye, seretay ewey ke meseley nîştimani beşêke le meseley giştî le barey gor'anî şorişewe, û meseley niştimanî le hemû core nilekanî şorişa pêsipêrrawi ciya ciyay xoy heye legel' suruşti şorişa rêk ekewî le hemû demêki mejûyî nasirawda, û pê be pêy ewe siyaseti partiş egor'ê le meseley nîştimanîda.

Le dewirî pêş şer'i cihanî yekema, katêk ke mêjû le Rûsyada pal'i be şorişi borcuwazî dîmokiratîyewe na be ser şano lew pêyey ke pêsipêrrawi ew demeye, markiste Rûsekan çar kirdinî meseley niştimaniyan best be çarenûsi înqîlabi dimokiratîyewe le Rûsyada. Partêkeman rûxani qeyiserêtî û rişekêş kirdinî paşmawey derebegi

û bîl'aw kirdinewey dîmokrasî 'e wul'atekeda be şêweyekî tewaw, be baştirin çar daye qel'em bo meseley nîştimanî, ke bituwanrê bikirê le say sêberî sermaydarîda.

Ewe bû siyasetî partî lem dewireda.

Wutare be nawbangekanî Lînîn le harey meseley nîştimanî ewe eger'êtewe bo em dewire, lew wutarane (çend serincêkî rexinegirane le barey meseley nîştimanî. ewe). Lînîn eme xuwarewey tiya el'ê: «.. Min be dil niyayî ·we el êm ke tenha taqe çarkirdinêk heye bo meseley nîştimanî, madem be wêneyekî giştî, tuwanî ewe. heye le dinyay sermaydarîda, û em çarkirdineş bil'awkirdinewey dîmokirasî binc dakutrawe. û bo îspatkirdinî ewe Siwîsra ehênime pêşewe be wêne ».

( Temaşay k. 17 , la. 150 , bike ).

Namîlkekey Sitalînîş ke nawî ( Markisîzim û meseley nîştimanî e) her eger'êtewe bo em dewire lewêda tiyatê ke :

«duwa rûxanî bizûtinewey nîştimanî nayete dî cige legel' rûxanî borcuwazêtî nebê. Herweha asa-

yiş be tewawî bin best na bê cige le dinyay soş-yal zima ne bê. Bel'am eşê le say sêberî sermaye-darîda têkoşanî nîştimanî rapêç bikirê bo sinûrî here kemî û le binçînewe hel bikendirê, û way lê bikirê here kemtirin ziyan bigeyenê be pir'olîtar-ya . Bam Siwîsra û Emerika bikeyin be nimûney em wêneye. û eweş êbê dimokiraşî le wul'atekeda bil aw bikirêtewe û tuwanayekî ewto bidirê be nasyonekan ke be serbestî bigor'ên».

Le piley dûwemîşa wata le dewirî şer'i cihanî yekema katê cengî dûr û dirêjî beyinî herdû bere rêkkewtûwekey Împiryalîstekan wuzey le Împir-yolîzimî cîhanî bir î, û katêk tengûçel'emey rijîmî sermayedarî geyişte pope, û katêk wul'ate dagîr-kirawekan û begel' kewtûwekan hestane ser piyan bo bizûtinewey rizigarî xuwazane tenîşt çînî kirê-karewe le ( wul'ate xawen musteimerekana» , û katêk meseley nîştimanî geşey kirid û bû be mese-leyekî nîştimanî û meselay musteimerat, û katêk berey yek girtûy çinî kirêkar le wul'ate semayeda-re pêşkewtûwekan û gele çewsawekanî wul'ate

musteimerekani wul'ate istîimar kirawe-
kan û begel' kewtûwekan desti kird bewey
bibête hêzêki rasteqine, û le encamda, ka-
têk m seley şorişi soşyalistî bû be mesele-
yeki demûdest, ew kate le tuwanay marki-
sîste Rûsekana nema ke be siyasetî dewirî
pêşû razî bin, û be pêwistyan zanî be çar-
kirdinî meseley niştimanî û meseley mus-
teimerekan bibestin be çarenûsî înqilabî
soşyalistewe.

Partî pêy wabû ke çaktirîn çar kirdin bo
meseley niştimanî û meseley musteimere-
kan le zurûfî ew h'eļeda rûxanî desel'atî
sermaye û cêgîr kirdinî dîktatorêtî piroli-
tarya, û der kirdinî leşkirekanî impiryalî
ste le sinûrî wul'ate musteimerekan û be-
gel' kewtûwekane û dan piyanane be heqî
ciyabûnewey em wul'ataneda û demeziran
dinî dewl'etî niştimaniye boyan, û rişekêş

kirdinî dujminayetî nîştimanî û nexmey regezperistî û behêz kirdinî peywendi internasyonaliste le beyinî gel ına, û rêkxistinî abûriyeki nîştimanî yekgirtûy muştereke û dameyirandinî hereweziyeki birayaneye le beyini gelana le ser em binçîneye, ewe bû siyaseti partî lem dewireda.

Em dewireş hêşta her dûr bû le maweкeyewe, çunke a ew deme destî pêkirdi bû, bel'am hîç gumanî tiya ne bû kewa lewela goy huner ebalewe.

Meseley dewirî êstey gor'anî şoriş le wul'atekemana legel' siyaseti îmr'oy partî ehmiyetêkî taybetî pê edirê.

Ebê destêk ra bikêşirê bo ewey ke wul'atekeman êste derî xistûwe ke taqe wul'atêki amadeye bo rûxanî sermayedari, û her be rastiş sermayedarî rûxandûwe û diktatorêtî pirolitaryay cêgîr kirdûwe.

Û le encamda kelêneke hêşta gewireye ber lewey dîktatorêtî pirolîtarya le **sinûrêkî Cîhanîda** bête di, be waleyekî tir ber lewey soşyalîzim **le gişt wul'atanda** zal' bibê.

Herweha ebê dest rabikêşin bo ewey ke ême, be le naw birdinî desel'atî borcuwazî ke le demêkewe le hel'sûkewitî konî dîmo-kiratyaney xoy çote derewe, pê sipêrrawî ( Bil'aw kirdinewey dîmokirasî tewaw le wil'atekemana ) çar kird û rijimî zordarî nîştimanîman le naw bird û çun yekî beyi-nî nasyonekanman hênaye dî le wul'ateke-mana.

Wak derkewtûwe diyare, em çarkirdi-nane çaktirîn hon bo rîşekêş kirdinî neẍ-mey regezperistî û qîneberayetî nîştimanî, û cêgîr kirdinî bawer' le beyinî gelana.

Duwayî ebê destêk ra bikêşin bo ewey ke le naw birdinî zordarî nîştimanî bû be hoy

jiyanewey nîştimanî ew nasyonancy kewa le raburdûda zor lê kiraw bûn le wul'ate-kemana, û bû be hoy behêz kirdinî peywendî hawr'êyetî înternasyonalistî le beyinî gelanî wul'ate kemana û rêkxistinî herewezî le beyinyana le barî damezirandinî soşyalîzimewe.

Pêswiste basêki ewe bikeyin ke em nasyonane rastewebûwane wek ew nasyone borcuwaziye konane ne mawnetewe ke borcuwazêtî pêşr'ewî ekirdin, bel'kû hemû nasyonî soşyalîstî tazen le ser daı ûperdûy nasyone konekanewe hel'qul'îwin û partî komel'anî xel'qî înternasyonalîstî zeh'metkêş pêr'ewiyan eka.

Sebaret be we partî way be pêwîst zanî ke destî yarmeyetî dirêj bika bo ew nasyonaney ke le wul'atekemana jiyawnetewe ta be hemû hêyêkiyanewe bikewine ser pê,

û kul'tûr'î niştimanîyan bikewête ı û û bi-
goı'ê, le ber ewe qutabixana û şano û gelê
nawiçey kul'tûr'î tir zor eka bo ewey zima-
ni zigmakî tiya bil'aw bêtewe, paşan dezga
partêkan û nêqabêkan û herewezêkan û
dezga dewl'etêkan û organe abûrêkan eka
be hî gel be wey endamekanî le rol'ey ew
nasyone da enê, paşan hemû mîleke nişti-
manėkan û partêkan û sovyatêkan exate jêr
destî xoyewe, û lixaw exate demî ewanewe
ke hewil' eden, serer'ay hemî jimarėyan, bo
tegeredan lem siyasetey partîda.

Emeş manay weye ke partî êste û leme
duwaş piştgîrî gor'an û geşe kirdinî kul'tû-
r'î niştimanî gelanî wul'atekeman eka, û
meseley cêgîr bûnî nasyone soşyalîste taz-
ekanman han eda, û bergirî kirdin bo em
meseleye û parastinî le hemû çeşine dujmi-
nêkî «Linîn» exate estoy xoy.

— 47 —

Le namekantana wa der ekewê êwe bem siyasetey partêkeman razî na bin, yekemîn hoy eweş eweye êwe nasyone soşyalîste tazekan legel' nasyone borcuwazê korekan têkel' eken û tê nageyiştin ke kul'tûr'e nîştimanêkanî nasyone sovyatîye tazekan be xoyan û nawerokyanewe kul'tûr'ê soşyalistîn. Û dûwemin, boy eweş, eweye êwe le meselekanî Lîninîma be tundiwe simkol' ekenbim bexşin le bekarbênani em wate naşirîneda - û be şêweyekî zor xiraf le meseley niştimanî hal'i bûn.

Êwe Serincêk biden bam bo em mesele sûkel'eyey xuwarewe bê ; hemûman bas le pêwistî şorişî kultûr'î ekeyin le wul'atekemana, ca eger le mewqifêkî tun û tol'a westayin beramber bem meseleye, û nextêk zimanî xoman le çenebazî girtewe, ew h'ele ebê yekemîn hengaw binêyin hem rêgeye-

da, wata ber le hemû şitêk ebê xuwêndewarî ser-
etayi be zor bisepênîh be ser hemû ndewrist ma-
nekanî wul'atekemana be ewey cmû hawniştima-
nekanî wul'atekemana be ewey ciyawazî netewa-
yetî tiya bê, paşan xuwêndewarî nawendî. Aşkira-
ye be bê ewe hiç gor'anêkî kul'tûrî le wul'ateke-
mana rû nada. Îtir way le qise kirdin ehênim le
barey şorişî kul'tûr'îyewe. Paşan be bê ewe biç
raperinêki rasteqîney pîşesazî û kiştûkal'îman la
der nakewê herweha wul'atekeşman bergirîyekî
ewtoy nabê piştî pê bibeştirê.

Bel'am çon etuwanrê ewê pêk bihênrê eger
hatû nîsbetî sedaney ne xuwêndewarekanî wul'a-
tekeman xiraye ber çaw ke hêşta her zor gewire-
ye, û le heeêk nasyonekanî wul'atekemana egate
80 - 90 le seda.

Le ber ewe ebê wul'ateke be tor'êkî çir' da bi-
poşîn le qutabxane û her be zimanî ew şuwênane
û mamostay way bo amade keyin ke şarezay zim-
anî ew şuwênane bin .

Le ber ewe pêwîste hemû cîhaze îdarêkan bi-
kirên he hî gel ber le partî û neqabîyewe heta
egate cîhazekanî dewl'et û dezga abûrêkan bewey

ke hemû endamekanî le rol'ey ew nasyone da binrên.

Bo eweş ebê rojname û şano û sînema û dezgay kul'tûrî tir bil'aw bikirêtewe be zimanî dayik û bawik.

Eger epirsin, boçî be zimanî dayik û bawik ? çunke be milwên le komel'ani gel etwanin serkewtinêkî zor bihênine dest le rûy gor'anî kul'tûr'î û siyasî û abûrîda tenha be zimanî bawik û dayik, wata be zimanî nîştimanî.

Paş bemû ewaney wutran pêm waye ke best kirdin bem base be giran' ne mawetewe ewiş eweye I înînîstekan, diyare eger wîstiyan be I înînîstî bi mêninewe, na bê le meseley nî timanîda rêy siyasetêkî tir bigirin cigee ew siyasete ne bê ke êste le wul'atekemana pêr'ewî ekirê .

Ey wa nîve ?

Kewate bam kotayî be baseke bihênîn Min lam waye weramî bemû pirsyarekartan û xeyal'ekantanim dayewe. 18 Mart 1929

**Îtir sil'awî komonîstanem pêşkeş ekem**

**Y. Sitalîn**

— 50 —

Y. STALÎN

Kirêkaranî dinya yekbigrin

# LÎNÎNÎZIM Û MESELEY NIŞTIMANÎ

Berpeçdaneweyekî hawrê Mêşkov û Kovalçuk
û xelkîtire Wergêranî le Erebîyewe:
Cemal Nebez

Gorînî le Latînîyewe: Salih Bêçar
2026